Berzanîyê nemir bêtir ji Pêncî Salî bi dilsozi û zanebûn Rêberîya tevaya xebata meyî Milî li seranserî Kurdistanê dida kirin. Wî Roj bi roj ve navê Kurd û Kurdistanê li seranserî Cîhanê de dida bilindkirin û xebata wî ji bona Serxwebûnê bi hêvitî ve dida bipêşvexistin û Serdariya Dagîrkerê Kurdistanê ji Rom, Ereb û Ecem dida hejandin û lerizandin.

Berzanî di Roja 6. 10. 1956 wate pêş 35 Salan de ew careke din ji bona Begdadê ji der bideryê hate vegerandin. Di Sala 1943 de wate pêş Pêncî Salî de ji Sulêmanîyê ji bona Berzan hate birêkevtin. Di rojê 2 tanî 12. 10. 1943 de bingehê Şûreşen birûmeti Berzanîyan ji bona Serxwebûna Kurdistanâ me hate hîmkirin. Pêncî Salî Berzanîyê nemir li ser Caran, li ser Kaşan, li ser Lat û Zinaran, li Şikevt û şikêran, li ser çiyan, li ser Neşivan, di nava Deşt, Dol û Newalan de rû li rû, sing bi sing bi mîrxasî, qehremanî û gernasî beramber bi Dujminan ve ji bona Serxwebûna Kurdistanê û Pêkanîna Dewleteke Milîyi Serbixwe di Rojhilata Navîn de dida xebatkirin. Wî Peymana 11 Avdara Sala 1970 date lidarxistin. Wî bi merdayeti binaxê vê Dewleta meyî Fêderalîyi perest ji me re date hîmkirin û cerg û hinavê Kurdistanê di Kerkûka perest de ji me re date ermanckirin.

Idrîsê Xweşevist ji me re ala Serxwebûna Kurdistanê piştî mirina Berzanîyê nemir di 1. Avdara Sala 1979 de date berz û balakirin. hêjibêtir wî di Salên Heşteyîn de ji nûve careke din bingehê Yekitîya meyî Milî di pêkanîna Berê Neşîmanîyî Kurdistan de date bicihanîn, ku bi saya vê Yekitîya meyî Milî Dewleta meyî Fêderalî û Parlemana meyî Demokrasi hate damezirandin.

Berzanîyê nemir û Idrîsê xweşevist di Berzan de, di cihê serên Bav û kalan de serên xwe li kêleka hevdu de dane danîn. Berzan bi axa xweyî perest ve herdu Şêrên Serxwebûna Kurdistanâ me di nava Ala Sê Rengîn de di nava singa xwe de date pêçandin û posandin.

Bijî Berzanîyê nemir û Idrîsê Xweşevist!

Bijî Hemû Gorîvanen Kurd û Kurdistanê!

Bijî Dewleta meyî Fêderalî, hêviya Jîna me, rûmeta Mirovanîya me!

Dr. M. S. Cuma

Çend gotinêner Wêrger

Xwendevanêner Hêja û birêz

Vaye ez Mêjûwa Kurd û kurdistanê Bergê Yekem û piştî demeke kurt Bergê Duwem jî bi Zarava Kurmançî li ber destêne we de didim danîn. Ez naxwazin pêşgotinê ji bona vê Wergerandina hanê bidim nivîsandin; ji ber Birayê Ismet Şerîf Wanlı bi dûr û dirêjî ve ji bona Bergê Yekem û Duwemê Mêjûwa Kurd û Kurdistan ji bona Xwendevanêner Kurd di Pêdeçûnekê de dide pêşkeşkirin.

Ez dixwazin bes û bi tenha ve çend gotinan ji bona Xwendevanêner Giramî bidim tomarkirin.

Kur û kîmanîyên vê Wergerandinê dê pirî zorbin. Ez ji dil û can ji Xwendevanan û Rexnevanan hêviya lêbuhrandinê didim daxwazkirin. Ev karê biçûk xewin û nigasa Zarotîya min ji bona pêşvexistina Zimanê meyî Perest û bêtir ronahîkirina Mêjûwa me ji bona Tudayê Kurd dûr yanji nêzîk dide bicianîn. Tevaya zanistî û zanebûna min bes û bi tenha ve dê di warê Ziman û Mêjûwa me de bête tîrxankirin; ji ber gîringbûna Zimanê me û Mêjûwa me ji bona Hebûna me, Azadîya me, Serxwebûna me, Pêkanîna Dewleteke Miliyî Serbixwe di seranseri Kurdistanê de û hêjibêtir xweşbûn û gesbûna jîna Civaka me hemû bi hemû ve di rîya pêşvexistina Zimanê me û ronahîkirina Mêjûwa me de tête dîtin. Dujminê me her û her him şerê Zimanê me û himjî şerê Mêjûwa me didin kirin. Di Mêjûwê de pir Milet hatin windakirin, gava ku wan Ziman û Mejûwa xwe ji nava destêne xwe dane berdan. Zimanê me bi hemû Zaravayê xwe ve mîna hemû Zimanê Rojhilat bi saman û dewlemend ve tête dîtin. Ew bi karanîna kevnarîya pir qert ve tête dîtin. Pê ji pêtir Hezaran Sal Avesta hatîye nivîsandin. Destûr, Qanûn û Yasayê bi nav û bangê Mirovanyê pê hatine tomarkirin. Mêjûwa me bêtir ji Pênc Hezar Sal di nava Kurdistanâ me de di kanîyên Somerî de hatîye tomarkirin. Hîç Mêjûwa Rojhilata Navînî bê Mêjûwa Kurd û Kurdistanê nayete liberkevtin. Em divê tevaya xebata xwe di her warekî Jînê û Serûştiyê de li ser bingehê Zanistiyê bidin danîn. Hêjî bêtir divê ku em tevaya Zanebûn û Zanistiyâ Mirovanîyê bi Zimanê Kurdiyî perest li ber Tudayê Kurd de bidin danîn. Karê me nebes tenê ku em Kurdistan azad bikin, divê em Kurdistanê ji bona xwe û Nifşen tên avabikin, gesbikin, xweşbikin û bextiyarbikin. Kurdistan bi saya dilsoziya me, zanebûn û zanistiyâ me ve dê bi Serxwebûnê û Pêkanîna Dewleteke Miliyî Serbixwe ve bête bi tac û xelatkirin. Dewleta me di Kurdistanâ Jêrin de hêviya Jîna me ye. Dujminê me ji ber wê taya mirinê dane girtin. Ew ji tevaya Dunyayê re Serxwebûna Kurdistanê û Pêkanîna Dewleteke Miliyî Serbixwe di seranseri Kurdistanê de dide mujdekirin.

Min Bingehê Wergerandina xwe li ser Bingehê Koka Kurdi-Zarvayê Soranî de dayite danîn. Min pir sôd ji Wergerandina Erebî dayite wergirtin. Bi servekirinê di Wergerandina Erebî de min ew dane wergerandin. Rûnkirinê Daner Mohamed Emîn Zekî Beg hemû hatine wergerandin, bêyî ku Navê wî di dawîya wan de bête tomarkirin. Rûnkirinê Mohamed Elî Ewnî hatine wergerandin û di dawîya wan de Mohamed Ewnî (M. E) hatîye nivîsandin.

Ez Wergerandina Kurmanciyî Nivista Mêjûwa Kurd û Kurdistanê ji bona Dr. Nuredîn Zaza didim pêşkeşkirin. Min di jîna xwe de gelek Mirovân Gewreyêner Kurd dîtin. Ew Yekek bû, ku wî pir di tevaya Felsefa jîna min de date kîrkirin.

Ez dixwazim li vêderê de tevaya sipasîya xwe ji wan Mirovan re bidim pêşkeşkirin, yên ku wan pir yarmetîya min di wî warî de dane kirin û bi taybetî ez sipasên xwe ji bona Fewzî Esed didim pêşkeşirin ji ber bi saya serê wî ve hemû karêne min tên lêvenerandin û rastkirin.

Dr. M. S. Cuma

Berlin, di 12. 2. 1994 de

Berlin, di 2. März 1994 de

Bîranîna derbasbûna Panzdeh Salan li ser mirina Berzanîyê Nemir de

Xweşk û Birayên Xwşevist û Mêvanên berêz!

Hemû Miletên vê Dunyayê xwe bi xwe û bi destêن xwe ve Mejûwa xwe didin durustkirin. Di nava qonaxêن cudayî teng û tariyî Mêjûwa van Miletan jî de Mirovêن Gewre bi neçarî ve hatine peydakirin, da ku ew Welat û Miletê xwe ji wê tariyê u tengaviyê bidin rizgarkirin û rîya biserkevtin û pêşkevtinê ji wan re bidin text û rastkirin.

Wehajî bêgûman jî Berzanî ji bona Netewê Kurdi belengazî perçekiri Yekek Ji gewretîn Mezinên Kurdan di Mejûwa wî de tête dîtin. Wî bêtir ji Pêncî Salî tevaya Mejûwa xebata Kurdistanê bi dilsozî, mîrxasî û zanbûn date rîberikirin. Ev bi neçarî ve ji bona têgihiştian Mêjûwa me û hêjî bêtir ji bona liberketina Niha me û pêşbîniya Ayînda me li ser me de dide neçarkirin, ku em bi hûr kûrî ve, bi givaştî û gihaştî ve li jiyannama Berzanî û kîrêñ wîna di Mêjûwa me de lêbidin temâsekirin, da ku em ji bona serxwebûna Kurdistanê û pêkananîna Dewleteke Milîyî Serbixwe di seranserî Kurdistanê de gorîyê wê kêm bikin û dema gihaştina wê Armanca bilind kurt bikin.

Di Sala 1903 de Berzanî li Gundê Berzan de ji Malbateke bi rûmet ve hate zayîn. Vê Malbata ku hêjî ew roleke pirî giring di Mêjûwa me de dide listin.

Di vê pêle de Dewleta Osmanî, zindana Miletan ber bi jiberhevbkevtin û herifandina xwe ve dida bi lez û bezkirin. Dewleta Osmanî di Sala 1828 de biryara hilweşandina hemû Mîrneşînyêن Kurdan date dan, yên ku bingehêن wan ji bona Kurdan di Peymana Sultan Selîmê Yekem û Mewlana Idrîs de di Pêşîya Novebera Sala 1515 de hatibû gêrdan. Di sala 1848 de Mîrneşîniya Bedirxanîyî dawîyi Kurd hate ruxandin. Selteneta Osmanî Mezin û Gewreyêن Kurdan bi hezar fen û xapandin û bi dir û hovîti ve ji hev dane tar û markirin.

Ji nû ve li Berzan de, li vî cihê çiyayî sext de hêviya Kurdan ji bona rumetê, azadîyê û xweşbûna jînê hate berz û balakirin. Gundê Berzanîyî Biçûk û lipasveketi serê xwe dijî zor u sitema Dewleta Osmanîyê Bêganeyî bedkar bi vîn û evîna Kurdistanê ve date bilindkirin.

Şêx Eb-Dul.Selamê Birayê Berzanî ala xebata Milîyî rizgarîyê li ser Çiyayêن Berzan de date hejandin û agirê azadîyê careke din ji nû ve li ser deştêن û Çiyayên kurdistanê date vêexistin. Belam mîna her car vê carê jî bi bêbextîya Kurdan ve Şêx Eb-Dul-Selam hate girtin û ew di Sala 1914 de li Bajarê Musilê de ji bal Dewleta Osmanî de hate bidarvekirin.

Mustefa Berzanî di wê gavê de ligel Dêya xwe de di binê zindana Musulê de dihate dîtin. Wî bi Yanzdeh Salêن xwe ve di binê zindanê de destana Binemala xwe û hemû Miletê xwe bi herdu çavêن xwe ve dida dîtin. Wî Zarotîya xwe di nava wê destanê de bi tirş û talî ve, bi rebenî û belengazî ve dida rabuhurandin. Berzanîyan tevî perişanî û bedbextiya xwe ve serêن xwe ji bona Dewleta Osmanî nedan tewandin. Her û her wan ligel Dewleta Osmanî de di pêla Cenga Cihanîyî Yekem de di ceng û şer de bûn.

Li ser bingehê Peymana Sayks-Pîko de di Sala 1916 de li Bêrudê de Welatê meyî li jîr Dewleta Osmanî de di nava Dewletêن Hevalbendan ji Ingilîz, Firensa û Rusya de ji nû ve hate parvekirin.

Di Sala 1922 Perçeyek ji Kurdistanê bi destêن Dewleta Îraqê ve û Perçeyekî din bi destêن Surî ve hatin kevtin. ji wê rojê de Serdarêن Beganêن Ereb bi dir û hovîtiya xwe ve dirbûn û hovîtiya Ecem û rom dane lipiştixwehiştin. Beramberî van Serdarêن Dir û Hovêن Erebêن nuh bi neçarî Berzanî duçarî liberxwedana man û nemana xwe bûn. Pir caran Berzanî tûşî şerêن germ û giran bûn.

Di Sala 1931 de Mustefa Berzanî Rêberîya Supahîyi Berzanîyan date wergirtin. Wî dest bi xebata xwe ve ligel Dewleta Iraqê date kiran. Ev Dewleta Iraqeyî Dagirkera Kurdistaneyî nuh zor bi gelekî ve ji Dewleta Osmaniyî kevnar ve notir , dir û hovtir bû. Belam tevlivêji Berzanîyê Nûhatî hêviya rûmeta Kurdan ji bona azadîya Kurdistanê beramberî bi Leşkerê Iraqê ve ji bona qada ceng û şer hate dakevtin.

Di Rojên 2 tanî 12. 10 1943 de bingehê Şureşen birûmetî Berzanyanîyan ji bona Serxwebûna Kurdistanê hate hîmkirin.Wi ji Sala 1931 tanî 1945 de li dûhevdû de tanî Sala 1945 de xebata xwe di bin rewş û zînetên pîrî dujwar de dijî Serdarîya Iraqê û ji bona biçûktirin Mafeyen Mîlî û Mirovanyê bi neçarî ve dabû lidarxistin. Li paş payanbûna Cenga Cîhanîyî Duwem de di Sala 1946 de Berzanî bi Mal û Zarokêne xwe ve neçarî çûnê ji bona Komara Mehebadê bûn. Berzanîyan hemû hêz û hinera xwe ji bona xurtkirina Komara Mehebadê dane tîrxankirin û ew di nava Supahê Komarê de hatîn serbazkirin. Mustefa Berzanî bi Supahsalarê Komarê ve hate danîn. Bi serfirazî, bi serbilindî Berzanîyan xwe ji bona komara Kurdistanê li Mehebadê de didan gorîkirin, da ku hêviya xewna direjî Kurdan di Azadîyê, Serxwebûn û Demokrasiyê de bête bicîhatin Tevaya Tudeyên Kurdistanâ Iranê hêjî wê Canbêzarîya Berzaniyan di wan rojên teng û tar de nedane jibîkirin. Ew bi çavê berz û bala li wê Canbêzarîya Berzaniyan bi can û malêñ xwe ve ji bona xurtbûn û parastina Komara Mehebadê didin temaşekirin.

Di 16 Augosta Sala 1946 de li paytexê Komara Kurdistanê de, li Bajarê Mehebadê de Partîya Demokratî Kurdistanâ Iraqê di bin Serokitîya Berzanî de li ser bingehekî bilindî zanistîyê û li ser rewş û zîneta Kurdistanê de hate danîn. Bi sayê serê Berzanî û Xebatvanê dinî Kurdistanê ve Partî di bername û Peyrewa xwe de li ser Sê Bingehan de: 1. Çarekirina Pirsiyariya Milî di Mafeyê Çarenûsa Netewê kurd de, 2. Çarekirina Pirsiyariya Civakî di Kurdisztanê de û 3.Demokratikirina Civak û Xebata Kurdistanê de hate hîmkirin. Bi vî rengî ve qonaxeneke nuh , pir giring û xwînavî, lêbelê jî pir bi hêvi ve di Mêjûwa Xebata Meyî Siyasî de hate destpêkirin..

Di Sala 1947 de Supahê Iranê xwe bi ser Komara Mehebadê ve date rakişandin, da ku ew wî agirê azadiyê, hêviya jîna kurdan, yê ku ew di meydana Çar Çiran de di Sala 1946 hatibû vêketin, bi darê ço ji nû ve bidin temirandin. Berzanî xwest, ku ew bi hemû hêza Leşkerî ve li ber Komarê de bide dan. Belam Qazî Muhemed Serokê Komarê xwest, ku ew di rîya dan û sitendinê de ligel Dewleta Iranê de bi şêweyekî aşîfî ve çareyekê bide dîtin.

Berzanî bi dilekî şikestî ve xatirê xwe ji Qazî Muhemed Serokê Komarê date xwestin; ji ber ku wî tu bawerî bi soz û peymanen Iraniyan nedihatîn. Qazî û Berzanî hevdû hebêzkirin. Hêstir ji çavê van Qehreman li ser hinarkên ruwêñ wan de li ser bedbextîya Kurdan de dihatin herikandin. Qazî Ala Kurdistaneyî li ser Mêza xwe de, ya ku ew ji bal Encumeneke Çapanî jêre hatibû diyarîkirin, date hilgirtin û maçikirin û wî ew ji bona Berzanî date pêkeşkirin û bi dengî şikestîyî girî ve jê re date gotin:"Ez vê Ala perestî Serxwebûna Kurdistanê ji bona te didim sipartin, da ku tu vê durujmê Azadîya Kurdistanê bide parastin". Berzanî ev ala perestî Qazi Muhemed di tevaya jîna xwe de bi rumet ve date parastin u wî ew di berî payînbûna temenê xwe de ji bona Mesude Kurê xwe careke din ji nû ve bi gotinêñ Qazi ve date sipartin. Hêjî nihajî ev ala perestî Qazi Mohamed di Kurdistanâ jêriyî azad de li nik Mesud bi rûmet ve tête parastin.

Berzanî xwe bi Pêşmergên xwe ve xwe ji Mehebadê date kişandin. Leşkerê Iranê Soz û peymanen xwe nedan bicîanîn. Bê ceng û şer wan Mehebad dane girtin.

Şah Riza Pehlevî li paş dadkirineke Sipahiyî kurt ve Qazî Muhemed ligel Hevalen wî de li meydana Çar Çiran de datin bidarvekirin.

Bi lez u bez ve Supahê Iranê lidû şopa Berzanîyan çû. Wan jî dixweset, ku ew wan jî mîna Qazî Muhemed û Hevalen wîna bidin qirkirin. Belam tev li cudabûna hêz û hinerêñ

Supahî ve di navbera herdu alîyan de jî û sextbûna sarbûnê de jî Berzanîyan dikarîbûn ziyanê gewreyî mezin bi Leşkerê Iranî ve bidin xistin.

Piştî şer û cengên 53 rojên liduhevdû de di bin dujwartirîn mercên serma û seqemê de ligel Leşkerê Iranê, Iraqê û Turkî de Berzanî xwe li Çemê Arasê de bi Pêşmergên xwe date xistin û wî xwe û bêtir ji 500 Pêşmergên xwe bi Sovyête ve date gihadin û ew li wêderê de bi penahindî ve tanî Sala 1958 de ma. Van şer û cengên 53 rojî ligel Leşkerê Iranê, Iraqê û Turkî de di seranserî Cihanê de hozanî û konetiya bilndî Supahîyî Berzanî di şerên Partîzanî de date derxistin. Ji nû ve careke din bîrwerîyên Zeyzefon di Sala 401 Berî Zayinê de ligel Kardoxan li Kurdistanê de û şer û cengên Selah El-Dîn di dawîya Sedsalên Duwanzdehan de ligel Xaçperestan de di Felestînê de hatin bibîrxistin. Raste, ku Berzanî bi neçarî ve ew ji Welatê xwe hate derkevtin û ew ji bona Sovyête çû. Belam ew her û her di nava cerg û hinavê Miletê xwe de û di seranserî Kurdistanê de bi Qehreman û hêviya bêhempa ji bona serxwebûna Kurdistanê dihate dîtin. Roj bi roj navê wî li asuwê Kurdistanê de dihate berz û balakirin.

Di Sala 1958 de Şureşa Iraqê di bin Serokitiya General Qasim de Serdariya Padşahî date wergerandin û Komara Iraqê date dasanîn. wê hêviyeke mezin ji bona kurd û Ereban date xuyanîkirin, ku ew mîna Du Miletên Hevparî mînahev ligel hev de bi aşîfî û Biratî di nava Komara Iraqa Ereb û Kurdan de bi xweşî û bi bextiyarî ve bêtin jiyandin.

Berzanî ligel Hevalên xwe de ji bona Iraqê di Sala 1958 de hatin vegerandin. Bi Hezaran Sedhezaran ji Kurd û Ereban pêsewazîya hatina Lehengan li wan de dane kirin. Wî tevaya hêz u hinera xwe ji bona xurtkirin û hîmkirina Komara Iraqê date tirkankirin û wî xwe nala Serbazekî wê date danîn; ji ber ku Destûra Komara Iraqê Ereb û Kurd bihevbes ve di Dewleta Iraqê de didan danîn.

Belam vê hêviya xweş û bextîyar neda dirêjkirin, ji ber ku Qasim xwest, ku ew mîna Padşahekî bi serêxywe ve bide serdarîkirin, mafeyê Kurdan bide hilanîn, Rêberên wan bide kuştin, û Kurdan bide erbkirin.

Di 11. Ilula Sala 1961 de Leşkerê Iraqê xwe bi ser kurdistanê ve date rakişandin. şer û ceng li ser de date vêxistin, da ku ew Miletê Kurd bide jérdestkirin û Rêberên wî bidin nabûdkirin.

Berzanî ligel Partîya Demokratî Kurdistan bi her awayekî xwestin, ku ew bi Aşîfî pirsiyârian ligel Dewleta Iraqê de li ser bingehê berjewendiya Gelê Iraqê de bi Kurd û Ereb ve bidin çarekiran. Belam Qasim şer date gûr u harkirin. Weha şureşa Ilulê ji Sala 1961 de tanî Sala 1975 de di bin Rêberiya Berzanî de hate lidarxistin. Di vê dema man û nemanê de Berzanî Hêza Çekdariyî Pêşmergê Kurdistanê date likarxistin. Van Pêşmergên Qehremanenê Nevîyen Midya durujmê Kurdistan yanji neman datin berz û balakirin û wan roj bi roj bi xwîna xweyî pak ve Xaka kurdistana perest ji gemara tapanên Dagîrkerên Ereb didan rîzgarkirin. Roj bi roj Berzanî cihê Partîya Demokratî Kurdistanê di nava Cemawerên Welêt de dida xweşkirin û biçikirin. Bi Hezaran Sedhezaran ji baştîrîn Keç û Kurên Kurdistanê xwe li dora ala Partî ji bona rîzgarkirina Welatê xwe didan komkirin û bi merdayetî can û malên xwe didan gorîkirin. Wan roj bi roj bi xwîna xweyî pak ve dara azadîya Kurdistanê didan avdan.

Berezanî bi konebûn û zanebûna xwe yekîtiya Kurdan her û her dida parastin, ji ber wi baş dida zanîn, ku hemû bedbextiya me di seranserî mîjûwa me de di nezanî û nebûna yekîtiya me de tête ditin. Wî Yekîtiya Kurd nebes tenê di Kurdistanâ Jêrin de herwehajî di tevaya Kurdistanê de bi mercê bingehî ji bona bisereketinê di Serxwebûn û Pêkanîna Dewleteke Miliyî Serbixwe de dida dîtin. Wi şev û rojê ji bona vî karê perest dida xebatkirin, da ku ev Yekîtiya hanê di nava Hemû Kurdan de bête hîmkirin.

Herwehajî wî pênwendîyên xwe di derve de ligel hemû layekî de li ser berjewendîya

Kurdistanê de dida lidarxistin. Roj bi roj navê Kurd di Cihanê de ligel navê Berzanî bêtir û bêtir dihatin nasîn û her jî bêtir û bêtir piştvanî ji bal Bîr û bawerîya Cihanê li Kurd de dihate girtin. Roj bi roj jî Dujminên me ji Rom, Ereb û Ecem ve di seranserî Dunyayê de dihatin rusras û tazî kirin, bê ka ew çend dir û hovin.

Vê Siyaseta hozan û bi hiş ve Dewleta Iraqê bi girêdana Peymana 11. Avdara Sala 1970 de date neçarkirin. Vê Peymana hanê Pirsiyariya Kurd di Kurdistana Jêrin de bi şêweyekî Demokrasî li ser berjewendîya Kurd û Ereb date çarekiran. Ev peymana hanê ji bona Kurdan bidestkevtineke gewreyî mezin bû.

Serdariya Iraqê xwst, ku ew ji xwe re ji Peymana 11 Avdarê bêtir bêhnê bide vedan û wergirtin. Wê di Sala 1974 de şer û ceng li ser Kurdan de date vêxistin û tevaya Leşkerê Iraqê bi ser Kurdistanê ve date rakişandin. Kurd careke din jî mîna her car neçar bûn, ku ew ji nuh ve liber man û nema xwe bidin dan. Tevaya Miletê Kurd li Kurdistana Jêrin de di bin Rêberîya Berzaniyê nemir de li ber hebûna xwe date dan. Di şerê Salekê de Leşkerê Iraqê Şazdeh Hezar Kuştî û Bîst û Pênc Hezar Birîndar li dû xwe de dane hiştin. Xurtbûna Supahîyî Iraqî roj bi roj bêtir û bêtir li ber berxwedana Kurdan de dihate lawzkirin. Di Şeşê Avdara Sala 1975 de li Bajarê Cezaêr de lihevhatinek di navbera Şahê Iranê Muhammed Riza Pehlewî û Sedamê Tekrîti de dijî Kurd hate lidarxistin. Şahê Iranê li ser vê peymanê de Rûbarê Şet El-Ereb û hin ji Melbendê ser Sînor de ji Xakê Iraqê ji xwe re datin sitindin û beramber bi van destkevtinan ve wî destêni xwe ji yarmetiya Kurdan date kişandin û sînorêni xwe di ruwêni wan de datin dadan. Weha bi vî rengî ve Şureşa 11. Ilula Sala 1961 de hate rûxandin.

Berzanî neçar bû, ku ew bi Pêşmergên xwe û bi Hezaran ji Penahindan ve ji bona Iranê bête çûyîn, yanjî divabûn, ku ew hemû bi hev re ji bal Leşkerên Iraqê bêtin nabûdkirin.

Berzanî date pêşbînîkirin, ku ev Peymana hanê di navbera Iraq û Iranê de pir nayête dirêjkirin; ji ber ku ew bi şer û cengê hatîye aviskirin û ew bi neçarî ve dê bi şer û cengeke xurttir û germtir ve di navbera herdu Welatan de bête vêketin.

Ji Sala 1976 tanî Sala 1979 de Berzanî ji nû ve Şureşa Kurd dijî Basêñ Begdadê date vêxistin. Wî bi vî rengî ve him bingehê Yekîtiya Kurd û him jî bingehê Dewleta Federalî di Kurdistana Jêrin de date danîn.

Berzanî di 1. Avdara Sala 1979 de li Waşinton de hate mirin. Termê Berzanî di Meha Avadara Sala 1979 de ji Waşinton ji bona Iranê hate veguhestin û ew li Şino de hate veşartin u ew li paş çend Salan de ji bona Gundê Helec hate veguhestin.

Di Roja 6. 10. 1993 de Termê Berzanîyê nemir û Idrîsê Xweşevist ji Kurdistana Iranê li Gundê Helec piştî veşaratina çend Salan li derbederyê de ji bona Kurdistana Iraqê hate ve-gerandin. Piranîya Xelkên Kurdistanê bi Hezaran Sedhezaran ve bi Pîr, Kal, Pîrek, Mîr, Keç û Kurêni xwe ve bi dilşikestî û him jî bi dilşadî ve pêşewazîya van Herdu Qehremanen xweyî Milî Gewreyen Réya Rumetê, Azadiyê, Serxwebûna Kurdistanê dane kirin. Tevaya rêzlê-girtina Gorîyen Serxwebûna Kurdistan me bi carekê ve di pêşwazîya Berzanîyê nemir û Idrîsê xweşevist de hate dîtin. Miletê Kurd bi hemû Hêz û Hinerên xwe ve, bi hemû Partî, Sazmendî, Kesêni nav û bangêni xwe ve, bi Parleman û Dewleta xwe ve di Kurdistana Jêrin de Serêni xwe beramberî mezinbûna van herdu Lawêni Gewreyen xwe didan tewandin û tevaya serpêhatîya jina wan, xebata wan, dilsozîya wan ji bona Serxwebûna Kurdistanê, xurtkirin û bihêzkirina Dewleta xweyî perest û Yekgirtina Netewê Kurd didan danîn. Hêstir li ser hinarkêni rûwan de ji ber xwe dihatin herikandin. Ji alîyê din de şadî û bextiyarî bi ve-gerandina van Qehremanen ve ji bona Kurdistana Perstî azadkirî li rûwan de dihate geşkirin. Bi Hezaran Sedhezaran ji Xelkêni Bajar û Gundan, Pêşmerge û Supahêni Kurdistanê bi qêrin û bang dikirin: Bi xêr bêni, bi xêr bêni... Dayika Welêt çavdêriya we dide kirin. Rojeke wisa

di seranserî Mêjûwa me de nehatibû dîtin, ku weha têde Yekitîya Lawên Mîdfa dihate dîtin. Vê hatina Pirozî hanê Yekitîya meyî Milîyi windayî ji nûve di Asûwê Esmanê Kurdistana meyî Perest de date berz û balakirin û wê ew li bal Gerdûn de bi neçarî ve pişti demeke tarîyi dirêj di Buhuştâ Evsana Ereb de date bi cî û warkirin.

Berzanîyê nemir bêtir ji Pêncî Salî bi dilsozî û zanebûn Rêberîya tevaya xebata meyî Milî li seranserî Kurdistanê dida kirin. Wî Roj bi roj ve navê Kurd û Kurdistanê li seranserî Cihanê de dida bilindkirin û xebata wî ji bona Serxwebûnê bi hêvitî ve dida bipêşvexistin û Serdarîya Dagîrkerê Kurdistanê ji Rom, Ereb û Ecem dida hejandin û lerizandin. Pêncî Salî Berzanîyê nemir li ser Caran, li ser Kaşan, li ser Lat û Zinaran, li Şikevt û şikêran, li ser çiyan, li ser Neşivan, di nava Deşt, Dol û Newalan de rû li rû, sing bi sing bi mîrxasî, qehremanî û gernasî beramber bi Dujminan ve ji bona Serxwebûna Kurdistanê û Pêkanîna Dewleteke Milîyi Serbixwe di Rojhilata Navîn de dida xebatkirin. Wî Peymana 11 Avdara Sala 1970 date lidarxistin. Wî bi merdayetî binaxê vê Dewleta meyî Fêderaliyî perest ji me re date hîmkirin û cerg û hinavê Kurdistanê di Kerkûka perest de ji me re date armanckirin.

Xweşk û Birayêñ Heja!

Gava em Iro Birwerîya Panzdeh Salêñ Mirina Berzanîyê nemir didin anîn em dixwazin, ku em pêre jî Birwerîya Heşt Salêñ Mirina Idrîsê xweşevist bidin anîn.

Idrîsê Xweşevist ji me re ala Serxwebûna Kurdistanê pişti mirina Berzanîyê nemir di 1. Avdara Sala 1979 de date berz û balakirin. hêjbêtir wî di Salêñ Heştîyîn de ji nûve careke din bingehê Yekitîya meyî Milî di pêkanîna Berê Neşîmanîyî Kurdistan de date bicihanîn, ku bi saya vê Yekitîya meyî Milî Dewleta meyî Fêderali û Parlemana meyî Demokrasî hate damezirandin. Berzanîyê nemir û Idrîsê xweşewist ji me ra datin diyarîkirin, ku divê bi her aveyekî ev Yekitîya meyî Milîyi perest bête parastin û xurtkirin. Bi rasti ji evaya bingehê man û nema Dewleta me ye. Em vê yekitiya xweyî Milî di Kurdistanâ Jêrîn de bi saya wê dûrbîniyâ Berzanî nemir û Idrîsê xweşewist didin parastin û bihîmkirin.

Berzanîyê nemir û Idrîsê xweşevist di Berzan de, di cihê serêñ Bav û kalan de serêñ xwe li kêleka hevdû de di 8. 10. 1993 de dane danîn. Berzan bi axa xweyî perest ve herdu Şêrîn Serxwebûna Kurdistanâ me di nava Ala Sê Rengîn de di nava singa xwe de date pêçandin û poşandin.

Xeşk û Birayêñ Hêja!

Berzanîyê nemir tevaya xebata me di seransî Kurdistanê de dida gewdekirin û hemû nişan û ruçikên başî Kurd didan derxistin. wi rojekê ji rojan şer nedida xwestin. wî her û her dostanî û Aşîti di nava kurd û Miletêñ Turk, Erem û Ecem de dida xwestin. Wî her û her Yekitîya Kurdish di Serxwebûnê, Xweşîya jînê û Bextiyarîyê de dida xwestin. Tevaya Felsefa jîna wîna li ser rastiyê, Pakîyê û lêbuhurstandinê de dihate hîmkirin.

Xweşk û Birayêñ Xweşevist!

Em di vê roja Bîranîna Mirina Berzanîyê nemir û Idrîsê xweşevist de bîrwerîya tevaya Gorîvanêñ rîya Azadî û serxwebûna Kurdistanâ xwe didin kirin Em serêñ xwe beramberî mezinbûn û dilsoziya wan Gorîvanêñ Azadî û Serxwebûna Kurdistanê didin tewandin.

Berlin, di 13. März 1994 de

Prozbayî bi hatina Cejna Newroza me

Xeweşk û Birayên şêrîn û Mêvanê Delal!

Netewê Kurdî perçekirî di nava Kurdistanâ xweyî birindar de Cejna Newroza xwe dide lidarxistin. Ji Sala 612 Berî Zayına Isa tanî niha de Kurd Sal bi Sal ve agirê Newroza xwe, agirê jîn û evînê, Agirê Hêvîya Seçwebûn û xweşbûna Kurdistanê li ser Çiyayê xweyî bilind de dide vêxistin. Hezar Salên xwînavî di bin zor û sitema Dewleta Aşurî de date dirêjkirin, tanî ku Kurd Ajdehakê Serdarîya Asurî date tar û markirin. Ji wê Rojê de, ji wê Salê de tanî roja meyî nihajî Cenja Newroz Sal bi Sal ve di nava Welatê me de tête lidarxistin û Salnama me jî pê tête jimartin.

Dujminê Serdarê Dagîrkerê Kurdistanâ me ji Rom, Ereb û Ecemê Bedkar nebes tenê ew dixwazin Dewlemendîya Welatê me ji xwe re bidin talankirin û Miletê me ji xwe re bidin Kole û bendekirin, hêjî biserdejî ew dixwazin Miletê me ji ser ruwê Zemîna wî bi Bombê Kîmyawî û Biyolocî ve bidin qirkirin.

Tevlivê vê Dir û Hovbûna Dagîrkerê Kudistanê jî rojekê rojan jî Agirê Newrozê, Agirê Jinê, Agirê Serxwebûnê û Azadîya Kurdistanê di nava cerg û hinavê Nevîyê Mîdyâ de nehatîye rawestandin. Bi hezaran Sedhezaran ji baştîrîn Keç û Lawê xwe di seransrî Mêjuwê de me bi merdayetî ji bona Rizgarkirin û Serxwebûna Kurdistanâ xwe dane gorîkin. Roj bi roj ve me dara Newroza xwe bi Xwîna Hezaran ji Pakêx xwe ve daye û hêjî didin avadan.

Pîstî xebateke xwînavîyî dirêj de di Kurdistanâ Jêrin de, piştî avêtina Bombê Kîmyawî û Biyolpcî di 15 Nisana Sala 1987 de, pîstî textkirina bêtir ji 4500 War, Gund û Bajarêne me, piştî derbiderkirina bêtir ji Sê Milyonêne Kurd ji nava Cî û warêne wan ve ji bona serê Çiyan birçî û tazî di bin baran û berfê de di Sala 1991 de ji nû ve Bir û bawerîya Cihanê bi hewara Kurdan ve hat û Dewletên Hevalbedan Sîwana parastinê ji bona Beşekî Mezin ji Kurdistanâ Jêrin date vedan. Ji wê rojê de Xaka kurdistanâ me ji gemara Tapanêne Dagîrkerê Hov û Dirêne Kurêne Sedam hate pakkirin. Ji wê roje de Newroza me bi Helbijaratina Demokrasî, bi Pêkanîna Serdarîya me û Dazanîna Dewleta meyî Fêdralî di nava Welatê me de hate bi tac û xelatkirin. Ev Dewleta meyî Fêdralî rûmeta me ye, hêvîya jîna me ye, na hêjî bêtir ew mirovanîya me bi xwe ye. Wê Demokrasî û Mafeyê Mirov di nava xwe de bi bingehê Destûra xwe ve dayîte danîn. Ew ji bona Çihana Sêyem bi vê Demokrasiyê û bingehê Mafeyê Mirov ve di vê Dunyaya me de nemûne ye. Ev Demokrasî û Mafeyê Mirov bênenmûne di nava Kurdistanâ Jêrin de tevaya hêz u hinera me ye. Bir û bawerîya Cihanê û Dewletên Hevalbendan vê siyaseta hozan û dûrbîniyî Serdarîya Dewleta meyî Fêdralî ji dil û can didin piştgirtin û pê jî û ji bona wê jî ew vê Dewleta meyî Fêdralî di Kurdistanâ Jêrin de didin parastin.

Dewletên Dagîrkerê Kurdistanâ ji Rom, Ereb û Ecem qîlêne xwe ji bona Kurdistanâ Jêrin di civînêne xwe de li Teharan, Enqera û Şamê de didin sûtin. Ew dixwazin vê Dewleta Fêdralî, Keleha Domdoma me, Hêvîya jîna me careke din ji nû ve bi hev re bidin tar û markirin û agirê Newroza vêketî piştî demeke tarîyî dirêj de di Buhuştâ Avsana Ereb de bidin temirandin. Ev Xewin û Nigaşa Serdarê Dagîrêne Rom, Ereb û Ecem vala ye; ji ber ku Miletê Kurd li Kurdistanâ Jêrin de Yekîtiya xweyî Miliyî di mêj de windakirî ji nuve dayite vejandîn û hîmkirin. Bi saya vê Yekîtiya Milî ve Yekîtiya Berê Neşîmanîyî Kurdistan hate sazkirin û li ser bingehê wê jî û bi saya wê jî ev bidestkevtinê hanê tevde di Kurdistanâ Jêrin de bidestêne me ve hatin kevtin û bi saya wê jî dê ew tevde bêtin parastin. Kak Mesud û Mam Celal bi Xwîna Hezaran Sedhezaran ji Gorîvanê Kurdistanâ dane sundxwarin, tanî

ku ew saxibin, dê ew vê Yekitîya Miliyî Perest bidin xurtkirin, geşkirin û parastin. Ev mujdeyeke pir xwesi Newroza me ji bona Miletê me ye; ji ber man û nemana Dewleta meyi Fêderalî li ser bingehê vê Yekitîya meyi Mili de tête hêmkirin. Ev Yekitîya Milî di Kurdistana Jêrîn de li seranserî Kurdistanê de bi xurtî ji bona Yekitîya tevaya Hêzên Milî ji bona xebata rizgarkirinê û Serxwebûnê dide kerkirin. Herwehajî di Kurdistana Jêrîn de ew hêviyeke gewre ji bona rizgarkirina Kerkuka perest ji bin Jêrdestîya Sedam dide peydakirin û ew bingehêna baş ji bona çarekirina Tengavîya meyi Abûri dide danîn; ji ber di Kurdistana Jêrîn de di encamê siyaseta li duxwesutandi de Sedam Welatê me bi kavil û wêran date hiştin. Hêjî bi serdejî ew ji bal Yekgirtina Netewan de dorlêpêcana Abûri jî lê tête girtin. Miletê me di bin rewseke pirî dujwar de tête jiyandin. Ji Havîna Çûyîn de tanî niha jî hêjî Elektirkî ji ser Parêzgeha Dihokê ji bal Sedamê Xwînrêj hatîye birrandin. Roj bi roj ji bal Dewletên Dagîrkerê Kurdistanê ve bi her awayekî ve, çi bi dizî ve, çi jî bi eßkere ve û çi di warêni siysi, abûri û supahî de li ser Kurdistanâ Jêrîn de ceng û şer tête lidarxistin. Tevî li wê perişanîyê, rebeniyê û nexweşiyê de jî Miletê me xwe bi qehremanî ve dayite ragirtin. Ew Dewleta me, hêviya Newroza me, Rumeta jîna me û berhema Gorîyê bi Hezaran Sedhezarn ve mîna Şêx Seid, Şêx Mehmud, Qazî, Berzanî, Qasimlo û Seid dide parastin û ew Durujmê: Kurdistan yanî neman de dide berz û balakirin.

Ji nû ve Newroza Jîna me ji Sala 612 Berî Zayînê de di Kurdistanâ Jêrnîn de bi aheng, semawend, govend û dîlan ve bi dahol û zurna ve li ser çiyan, di nava dol, gelî, deşt û mîrgan de tête lidarxistin û ew ji tevaya Dunyayê re Serxwebûna Kurdistanâ me û Pêkanîna Dewleteke Milî di Seranserî Kurdistanê de di Rojhilata Navînî de dide mujdekirin.

Raste, ku iro Dagîrkerê Kurdistanê ji her roj bêtir har û martir bûne. Ew Miletê Kurd ji bicûktirîn mafeyê mirovanyê didin bê pişk û parkirin. Ew bi hezaran Sedhezaran ve ji Keç û Lawê Kurdistanê di binê zindanê xwe de didin girtin. Ew xwe mîna Cenaweran di nava xwîna Miletê me de didin vegivizandin û ew li ser serêni wî û gewde û lasen wî de di vî Sedsalêni Bîstan de didin gêrekirin. Ew Mirovan ji Mêran, Pîrekan, ji Pîr û Kalan, ji Zarok û Menalan mîna Cengîzhan bi saxî ve didin vegurandin û sûtandin; ji ber ku ew bes û bi tenha ve Kurdin. Dir û Hovbûneke wisa, mîna ku ew niha ji bal Dagîrkerê Rom, Ereb û Ecem li Kurdistanê de tête kirin, ew iro di vê Cihana meyi Bajartiyê de nayete dîtin. Ne bi xurayî jî roja Newroza me ji bal Yekgirtina Netewan de bi roja Liberxwedanê ve dijî Regez û Rehperestiyê li seransrî Dunyayê de hate danîn.

Keleha Domdoma me, Dewleta meyi Demokrasîyi Fêderalî, hêviya jîna Kurdistanâ me cerg û hinavêni Dujminê me roj bi roj ve bêtir dide givaştin û sûtandin. Taya mirina Reş bi wan ve hafîye kevtin. Ne bez û ne rev jî ji wan re ji ber Serxwebûna Kurdistanâ me tête dîtin. Nevêyêni Midya vane şiyar bûne. Nema Bedkarêni Rom, Erem û Ecem xwe li ber van lafawêni şepolêni pêlêni Gorîvanêni Serxwebûna Kurdistanâ xwe dikarin bidin girtin

Em ligel Rom, Ereb û Ecem de Dostanîyê, Aşîtiyê û Wekhevîtiyê didin daxwazkirin. Bes û bi tenha jî em jî dixwazin mîna wan bi Serbixwe ve di nava Welatê xwe de bi azadî, bextiyarî, aşîti, Ewletî û xwesi ve bêtin jiyandin. Em dixwazin Kurdistanâ xwe ji gemara Bedkarêni Rom. Ereb û Ecem bidin pakkirin û wê bidin azadkirin. Em dixwazin nebes tenê Kurdistanâ azadbikin, lêbelê jî wê ji xwe re û ji Nifşen tên avabikin, xweşbikin, geşbikin û bextiyarbikin. Wê jî di nava Civaka Mirovanyê de di cîhekî bi şan û rûmet de bi cî û war bikin û Ala xweyî Sê Rengîn ji ser singen xwe bidin rabikin û li ser çiyayen Gotî de wê bi cî û war bikin û Agirêni Newrozê li nik wê de bidin vêxistin, da ku ew agirêni Jîn û Evînê careke din neyêtin temirandin, da ku em Careke din Rastiyê, Pakiyê û Lîbuherandinê di nava Kurdistanâ xweyî perest de bidin bingehkirin

Iro gava ku em vê Cenja Newroza xwe lidardixin, em serêni xwe beramberî hemû Gorîvan û Girtîvanêni reya Azadî û Serxwebûna xwe didin tewandin.

Her bijî Newroza me! Hher bijî Dewleta meyi Fêderalî, hevîya şan û rumeta me!

Prozbayî bi hatina Cejna Newroza me

Netewê Kurdî perçekirî di nava Kurdistanâ xweyî birindar de Cejna Newroza xwe dide lidarxistin. Ji Sala 612 Berî Zayına Isa tanî niha de Kurd Sal bi Sal ve agirê Newroza xwe, agirê jîn û evînê, Agirê Hêvîya Serxwebûn û xweşbûna Kurdistanê li ser Çiyayên xweyî bilind de dide vêxistin. Hezar Salên xwînavî di bin zor û sitema Dewleta Aşurî de date dirêjkirin, tanî ku Kurd Ajdehakê Serdarîya Asurî date tar û markirin. Ji wê Rojê de, ji wê Salê de tanî roja meyî nihajî Cejna Newroz Sal bi Sal ve di nava Welatê me de tête lidarxistin û Salnama me jî pê tête jimartin û tomarkirin.

Dujminêñ Serdarêñ Dagîrkerêñ Kurdistanâ me ji Rom, Ereb û Ecemêñ Bedkar nebes tenê ew dixwazin Dewlemendîya Welatê me ji xwe re bidin talankirin û Miletê me ji xwe re bidin Kole û bendekirin, hêjî biserdejî ew dixwazin Miletê me ji ser ruwê Zemîna wî bi Bombêñ Kîmyawî û Biyolocî ve bidin qirkirin.

Tevlivê vê Dir û Hovbûna Dagîrkerêñ Kurdistanê jî rojekê rojan jî Agirê Newrozê, Agirê Jinê, Agirê Serxwebûnê û Azadiya Kurdistanê di nava cerg û hinavêñ Nevîyêñ Mîdyâ de nehatîye rawestandin. Bi hezaran Sedhezaran ji baştîrîn Keç û Lawêñ xwe di seransrî Mêjuwê de me bi merdayetî ji bona Rizgarkirin û Serxwebûna Kurdistanâ xwe dane gorîkin. Roj bi roj ve me dara Newroza xwe bi Xwîna Hezaran ji Pakêñ xwe ve daye û hêjî didin avdan.

Piştî xebateke xwînavîyî dirêj di Kurdistanâ Jêrin de, piştî avêtina Bombêñ Kîmyawî û Biyolpcî di 15 Nisana Sala 1987 de, piştî textkirina bêtir ji 4500 War, Gund û Bajarêñ me, piştî derbiderkirina bêtir ji Sê Milyonêñ Kurd ji nava Cî û warêñ wan ve ji bona serên Çiyan birçî û tazî di bin baran û berfê de di Sala 1991 de ji nû ve Bîr û bawerîya Cîhanê bi hewara Kurdan ve hat û Dewletêñ Hevalbendan Sîwana parastinê ji bona Beşekî Mezin ji Kurdistanâ Jêrin date vedan. Ji wê rojê de Xaka kurdistana me ji gemara Tapanêñ Dagîrkerêñ Hov û Dirêñ Kurêñ Sedam hate pakkirin. Ji wê roje de Newroza me bi Helbijaratina Demokrasî, bi Pêkanîna Serdarîya me û Dazanîna Dewleta meyî Fêdralî di nava Welatê me de hate bi tac û xelatkirin. Ev Dewleta meyî Fêdralî rûmeta me ye, hêvîya jîna me ye, na hêjî bêtir ew mirovanîya me bi xwe ye. Wê Demokrasî û Mafeyê Mirov di nava xwe de bi bingehê Destûra jîna xwe ve dayîte danîn. Ew ji bona Çihana Sêyem bi vê Demokrasiyê û bingehê Mafeyê Mirov ve di vê Dunyaya me de nimûne ye. Ev Demokrasî û Mafeyê Mirovî bênimûne di nava Kurdistanâ Jêrin de tevaya hêz u hinera me bi xwe ye. Bîr û bawerîya Cîhanê û Dewletêñ Hevalbendan vê siyaseta hozan, kone û dûrbîniyî Serdarîya Dewleta meyî Fêdralî ji dil û can didin piştgirtin û pê jî û ji bona wê jî ew vê Dewleta meyî Fêdralî di Kurdistanâ Jêrin de didin parastin.

Dewletêñ Dagîrkerêñ Kurdistan ji Rom, Ereb û Ecem qîlêñ xwe ji bona Kurdistanâ Jêrin di civînêñ xwe de li Teharan, Enqera û Şamê de didin sûtin. Ew dixwazin vê Dewleta Fêdralî, Keleha Domdoma me, Hêvîya jîna me careke din ji nû ve bi hev re bidin tar û markirin û agirê Newroza vêketî piştî demeke tarîyî dirêj di Buhusta Avsana Ereb de bidin temirandin. Ev Xewin û Nigaşa Serdarêñ Dagîrêñ Rom, Ereb û Ecem vala ye; ji ber ku Miletê Kurd li Kurdistanâ Jêrin de Yekitiya xweyî Milîyî di mêm de windakirî ji nû ve dayite vejandîn û hîmkirin. Bi saya vê Yekîtiya Milî ve Yekîtiya Berê Neştimanîyî Kurdistan hate sazkirin û li ser bingehê wê jî û bi saya wê jî ev bidestkevtinêñ hanê tevde di Kurdistanâ Jêrin de bidestêñ me ve hatin kevftin û bi saya wê jî dê ew tevde bêtin parastin. Kak Mesud û Mam Celal bi Xwîna Hezaran Sedhezaran ji Gorîvanêñ Kurdistanê dane sundxwarin, tanî ku ew saxibin, dê ew vê Yekîtiya Milîyî Perest bidin xurtkirin, geşkîrin û parastin. Ev mujdeyeke pir xweşî Newroza me ji bona Miletê me ye; ji ber man û nemana Dewleta meyî Fêdralî li ser bingehê vê Yekîtiya meyî Milî de tête hîmkirin. Ev Yekîtiya Milî di

Kurdistana Jêrîn de li seranserî Kurdistanê de bi xurtî ji bona Yekitîya tevaya Hêzên Milî ji bona xebata rizgarkirinê û Serxwebûnê dide kérkirin. Herwehajî di Kurdistanâ Jêrîn de ew hêviyeke gewre ji bona rizgarkirina Kerkuka perest cerg û hinava Kurdistanê ji bin Jérdestîya Sedam dide peydakirin û ew bingehêن baş ji bona çarekirina Tengavîya meyî Aburî dide danîn; ji ber di Kurdistanâ Jêrîn de di encamê siyaseta li duxwesutandî de Sedam Welatê me bi kavil û wêran date hiştin. Hêjî bi serdejî ew ji bal Yekgirtina Netewan de dorlêpêcana Abûrî jî lê tête girtin. Miletê me di bin rewşike pîrî dujwar de tête jiyan din. Ji Havîna Çûyîn de tanî niha jî hêjî Elektirik ji ser Parêzgeha Dihokê ji bal Sedamê Xwînrêj hatîye birrandin. Roj bi roj ji bal Dewletê Dagîrkerêن Kurdistanê ve bi her awayekî ve, ci bi dizî ve, ci jî bi eşkere ve û ci di warên siysî, abûrî û supahî de li ser Kurdistanâ Jêrîn de ceng û şer tête lidarxistin. Tevî li wê perişanîyê, rebeniyê û nexweşiyê de jî Miletê me xwe bi qehremanî ve dayite ragirtin. Ew Dewleta me, hêviya Newroza me, Rumeta jîna me û berhema Gorîyên bi Hezarân Sedhezaran ve mîna Şêx Seîd, Şêx Mehmed, Qazî, Berzanî, Qasimlo û Seid dide parastin û ew Durujmê: Kurdistan yanjî neman dide berz û balakirin.

Ji nû ve Newroza Jîna me ji Sala 612 Berî Zayînê de di Kurdistanâ Jêrnîn de bi aheng, semawend, govend û dîlan ve bi dahol û zurna ve li ser çiyan, di nava dol, gelî, deş û mîrgan de tête lidarxistin û ew ji tevaya Dunyayê re Serxwebûna Kurdistanâ me û Pêkanîna Dewleteke Milî di Seranserî Kurdistanê de di Rojhilate Navînî de dide mujdekirin.

Raste, ku iro Dagîrkerêن Kurdistanê ji her roj bêtir har û martir bûne. Ew Miletê Kurd ji biçüktirîn mafeyê didin bê pişk û parkirin. Ew bi hezaran Sedhezaran ve ji Keç û Lawên Kurdistanê di binêñ zindanêñ xwe de didin girtin. Ew xwe mîna Cenaweran di nava xwîna Miletê me de didin vegivizandin û ew li ser serêñ wî û gewde û laşen wî de di vî Sedsalêñ Bîstan de didin gerekirin. Ew Mirovan ji Mêran, Pîrekan, ji Pîr û Kalan, ji Zarok û Menalan mîna Cengîzxan bi saxî ve didin vegurandin û sûtandin; ji ber ku ew bes û bi tenha ve Kurdin. Dir û Hovbûneke wissa, mîna ku ew niha ji bal Dagîrkerêñ Rom, Ereb û Ecem li Kurdistanê de tête kirin, ew iro di vê Cihana meyî Bajartîyê de nayête dîtin. Ne bi xurayî jî roja Newroza me ji bal Yekgirtina Netewan de bi roja Liberxwedanê ve dijî Regez û Rehperestîyê li seransrî Dunyayê de hate danîn.

Keleha Domdoma me, Dewleta meyî Demokrasîyî Fêderalî, hêviya jîna Kurdistanâ me cerg û hinavêñ Dujminêñ me roj bi roj ve bêtir dide givaştin û sûtandin. Taya mirina Reş bi wan ve hatîye kevtin. Ne bez û ne rev jî ji wan re ji ber Serxwebûna Kurdistanâ me tête dîtin. Nevêyên Mîdyâ vane şiyar bûne. Nema Bedkarêñ Rom, Ereb û Ecem xwe li ber van lafawêñ şepolêñ pêlêñ Gorîvanêñ Serxwebûna Kurdistanâ xwe dikarin bidin girtin.

Em ligel Rom, Ereb û Ecem de Dostanîyê, Aşîfiyê û Wekhevîtiyê didin daxwazkirin. Bes û bi tenha jî em jî dixwazin mîna wan bi Serxwebûn ve di nava Welatê xwe de bi azadî, bextiyarî, aşîtî, Ewletî û xweşî ve bêtin jiyan din. Em dixwazin Kurdistanâ xwe ji gemara Bedkarêñ Rom. Ereb û Ecem bidin pakkirin û wê bidin azadkirin. Em dixwazin nebes tenê Kurdistanâ azadbikin, lêbelê jî wê ji xwe re û ji Nifşen têñ avabikin, xweşbikin, geşbikin û bextiyarbikin. Wê jî di nava Civaka Mirovanyê de di cîhekî bi şan û rûmet de bi cî û war bikin û Ala xweyî Sê Rengîn ji ser singêñ xwe bidin rakirin û li ser çiyayêñ Gotî de wê bi cî û war bikin û Agirêñ Newrozê li nik wê de bidin vêxistin, da ku ew agirêñ Jîn û Evînê careke din neyêtin temirandin, da ku em careke din Rastîyê, Pakîyê û Lêbuherandinê di nava Kurdistanâ xweyî perest de bidin hîmkirin.

Iro gava ku em vê Cenja Newroza xwe lidardixin, em serêñ xwe beramberî hemû Gorîvan û Girtîvanêñ rîya Azadî û Serxwebûna xwe didin tewandin.

Her bijî Newroza me! Hher bijî Dewleta meyî Fêderalî, heviya şan û rumeta me!.

Parti Demokrati Kurdistan –Iraq– ,

Di 21 Avdara Sala 1994 de

Liqê Şeş –Ewropa– (ji bal Navçeya Elemania cardî hatîye çapkiran.)

Bi kurtî ve Jîyannama Berzanîyê Nemir

- * Di roja 14. 3. 1903 de di Gundê Berzan de ew hate zayîn.
- * Di Sala 1906 li temenê Sê Salî de ew ligel Dayika xwe de li Bendxana Musilê de hatibûn bêdekirin.
- * Di navbera Salên 1917–1919 de Şêx Ehmedê Berzanî Birayê wîyî gewre wî ligel Şêx Ab–Dul–Rehmanê Şernexê de ji bona likarxistina kar û barêن Sureşê ji bona nava Kurdistana Jorîn dide rîkirin. Li Bajarê Muşê de çavêن Berzanî bi Şêx Eb–Dul Qadirê Nehrî u Şêx Seidê Pîran ve têtin kevtin.
- * Di Sala 1919 de bi fermaña Şêx Ehmedê Berzanî ve bi Serokitîya Hêzekê ve ew ji bona hewara Sureşa Şêx Mehmudê nemir ve hate nardin. Beşek ji Hêza wî li Dola Piyaw de û Beşê din di nava Navçeya Balek de dihatin derbasbûn. di rê de ew tûşî şer û mer ligel Eşîrên dostêن Ingiliz de bûn û wan çend Gorîvan jî dan. Tanî ku berêن Hêzêن wî bi Navçeya Şûlêmanyê ve hatin gihaştin, Sureşa Şêx Mehmud kotahî pê hatibû u Şêx Mehmud bi xwe jî ve bi dîlî ve hatibû girtin.
- * Di navbera Salên 1920–1921 de ew ligel Hêzekê de ji bona hewra Entranik Paşayê Ermenî li Turkiyê de çû. Wî ew û çendîn Havalêن wîyî ermenî jî li kuştara Ermeniyêن Turkiyê de dane rizgarkirin. Wî Entranik bi Mala wî ve di rîya Zaxore ji bona Surî date derbaskirin. Wî di vê hewara Ermenîyan de bermabû Supahe Turkî 14 Gorîvan dane pêşkeşkirin.
- * Li 9. 2. 1931 de Li Raperîna Yekemî Barzan de li şerê Berqî Bege de bi Heştê Berzanîyan ve wî Supahê Dewletê date şikenandin. Dujmin 126 Kuştî li du xwe de date hiştin. Wî di vî şerî de Pênc Gorîvan dane pêşkeşkirin.
- * Li Şevêن 3/4 de li şerê Dole Vajî de wî Supahê Day date pirt pirtkirin. Wi beramber bi 12 Gorîvanan ve 235 Kuştîyêن Dujmin li qada şer de datin bicîhiştin.
- * Li roja 22. 6. 1933 de ew ligel hemû Malêن Berzanîyan de bi penahinde ve ji bona Xakê Turkî çû.
- * Li Buhara Sala 1933 de Serdarîya Turkîyê Şêx Ehmedê Berzanî date vegerandin û wê ew ji bona Serdarîya Iraqê date berdestkirin. Mustefa Berzanîyê Nemir bi xwe û Malêن Berzanîyan ve bi yarmetîya Birayêن Kurdêن Tukîyê ve xwe derbasî navçeya Berzan dane kirin. Wi Serdarîya Iraqê date neçarkirin, ku ew di kotaya Awgosta Sala 1933 de Şêx Ehmedê Berzanî jî bide azadkirin û ew ji bona Berzan bête vegerandin.
- * Li navrasta Sala 1936 de ew ji bona gift û bêjê ji bona Musilê çû. Li wêderê de dest bi ser ve hate danîn û ji layê Parêzgerê Musilêyî wê saye de Jeher pê hate dan. Bi derberzî ve ew ji mirinê li paş bê hishbûna Du Hefteyan de hate rizkarkirin. Her li kotaya wê Sale de ew bi xwe û Birayê wî Şêx Ehmed ve ligel hemû Malêن Berzanîyan ji bona Begdadê û Bajarêن din hatin veguhestin û dest li ser wan de hatin danîn.
- * Di 12.7. 1943 de Berzanîyê Nemir baş çendîn Sal derbiderî û destbiserî ve bi yarmetîya Partîya Hîwa û çend Kasêن Welatperwer ve ji Sulêmaniyê ji bona nava Şînoya Kurdistana Iranê hate derbaskirin. Serdarîya Iraqê û Iranê her Yekê ji wan Pêncî Hezar Dînar padaşt ji bona anîna serê Berzanî dane tirxankirin. Belam Berzanî di 28. 7. 1943 de ji bona Navçeya Berzan hate vegerandin. Li maweyê Du Mehan de wî bêtir ji Du Hezar Pêşmerge li dora xwe dane komkirin û Sureşa Berzan ji Sala 1943–1945 de date destpêkirin.
- * Di 2. 10. 1943 de şerê bi nav û bangê Şander hate lidarxistin.

- * Di 12. 10. 1943 de şerê bi nav û bangê Xêrozok hate lidarxisti.
- * Di 6. 11. 1943 de şerê bi navê û bangê Kuretu hate lidarxistin.
- * Di 10. 11. 1943 de şerê bi nav û bangê Mezne hate lidarxistin.
- * Di 29. 11. 1943 de gift û bêjê ligel Serdarîyê de date destpêkirin.
- * Di 15. 1. 1945 de wî Encûmena Azadîyê date pêkanîn.
- * Di 25. 8. 1945 de şer date destpêkirin.
- * Di 5. 9. 1845 de şerê bi nav û bangê Meydane Morik hate lidarxistin. Beramber bi pêşkeşkirina Pênc Gorîvanan ve Dewletê Heştê Dîl û 480 Kuştî li dû xwe de dane bicîhiştin.
- * Di 11. 10. 1945 de ew ji bona Kurdistanâ Iranê hatin.
- * Li 29. 4. 1946 de şerê bi nav û bangê Qarawa li Navçeyê Seqiz de û bergîrîkirina li Komara Mehebadê de di vî şerî de Heştê Serbaz û Efserên Supahê Iranî hatin kuştin û Sed û Bîst jî ji wan hatin dîlkirin, bi bê ku Hêzên Berzanî hîç ziyakê bidin dan.
- * li 15. 5. 1946 şerê gewreyê bi nav û bangê Melqerme yanjî Mameşah hate lidarxistin.
- * Di 16. 8. 1946 de Partîya Demokratî Kurdistanâ Iraqê hate pêkhatin.
- * Di Hefteya Yekema Avdara Sala 1947 de şerê Nelosê hate lidarxistin.
- * Di 13. 3. 1947 de şerê Kocar hate vêxistin.
- * Di 18. 3. 1947 de şerê bereyê Sino û Nêxede hate dadan.
- * Di 24. 3. 1947 de şerê Qarne li Navçeya Xane de hate lidarxistin.
- * Di 25. 3. 1947 de şerê Hevres û Helec li Navçeya Mergever de hate lidarkevtin.
- * Di 3. 4. 1947 de şerê Nêrkê –Berezir) hate vêketin. Berzanî bi xwe jî ve di vî şerê hanê de bi sivikî ve hate birindarkirin.
- * Di 19. 4. 1947 de ew ji bona nava Xakê Iraqe hate vegerandin.
- * di 25. 5. 1947 de ew bi Gundê Bay ve li Kurdistanâ Turkiyê de hate gihadin.
- * Di 27. 5. 1947 de bi Gundê Cîrmê ve li Kurdistanâ Iranê de hate gihadin.
- * Di 9–11. 6. 1947 de şerê mezînî Çiyayê Susenê û Deşta Mako Sê Roj û şevan date dirêjkirin. Bi bê westandin Supahê Iranê bi Top, Tank û Firokan ve di vî şerî de likarbûn. Supahê Iranê di demeke pêştir de xwe ji bona vî şerê hanê dabû likarxistin. Lebelê Berzanîyan ew datin şikenandin û cîgeh ji Sedan Kuştîyan ji wan 271 Kes Dil jî dane girtin.
- * di roja 18. 6. 1947 de Berzanîyê Nemir duwayî Kesê Hêza xwe bû, yê ku ew di nava Çemê Aras re hate buhurandin û ew ji bona nava Xakê Sovyêtê çû.
- * Di 29. 9. 1947 Berzanîyê Nemir ji Şarê Nêxîwanê li Komara Erministanê de ji bona Şarê Bakoyê Paytextê Komara Ezirbêcanê hate veguhestin.
- * Di 19. 1. 1948 de Li Konfirensê Giştî de, yê ku têde hemû Awarvanê Kurdistanâ Iraq û Iranê besdarbûn, Serkidayetiyeke Siyasîyî Hevbeşî ji bona Bizava Kurdîniyê hate helbijartin û Berzanî bi Serokîti ve ji bona wê Serkidayetiyeke hate helbijartin.
- * Di 29. 8. 1948 de Barzanî û Hevalen wî ji Bako ji bona Bajarê Taşqendê Paytextê Komara Ozbikistane hatin veguhestin.
- * Di 13. 3. 1949 de Berzanî ji Hevalen wî dane birîn û ew bi xwe ve ji bona Goma Oralê dane veguhestin û li wêderê de dest li ser de hate danîn.
- * di 1. 9. 1951 de ew ji bona Tasqend hate zîvirabdin.
- * Di Meha Golana Sala 1953 de Sitalin hate mirin û Xuroşov ji bo ser kar hat. Wî Berzanî ji bona Mosko date veguhestin û çend carekî jî çavê Berzanî bi Xuroşove hatin kevtin.
- * Di 6. 10. 1958 de li pas Şureşa Temuzê de li paş bêtir ji Duwanzdeh Salêñ derbird de ew ji bona Begdadê hate zîvirandin.
- * Li seretayê Avdara Sala 1960 de ew bi yekcarî ve ji bona Berzan hate vegerandin.

- * Di 11. 9. 1961 de Şureşa mezinê Ilulê date destpêkirin
- * Di 8. 2. 1963 de di dema Wergerandîna Serdariya General Qasim de ji bal Partîya Basî de Berzanîyê Nemir Dergehê Kurdistana Azadkirî ji bona parastina hemû Welatperwerên Ereb, Kurd û Kêmaniyê Miliyên din ji qirkirina Basîyan date vekirin.
- * Di 11. 3 1970 de Ewtomomî ji bona Kurdistana Iraqê de date bidestxistin.
- * Di 29. 9. 1971 de Dujminên Kurd û Kurdistanê Tepeke mezin ji bona kuştina wî dabûn danîn. Lebelê ew bi derberzî ve jê hate rizgarkirin.
- * Di Avdara Sala 1974 de wî dest bi şerê bergîriyê ve date kîrin.
- * Di Avdara Sala 1975 de li Encamê bi rîkkevtina Cezair û Pilana Nav Dewletan de Şureşa Ilula mezin hate kevtin û ew û bi Sed Hezaran ve ji Kurdên Iraqê ve ji bona Kurdistana Iranê hatin çûyîn.
- * Di 1. 3 1979 de di Welatên Yekgirtiyê Emerîka de bi nexweşîya Kevjal ve hate mirin.
- * Di 5. 3. 1979 de li ser temîniya wî de ew li Kurdistana Iranê li Bajarê Şino de li ser sînorê Kurdistana Iraqê û Turkiyê de ji bona Xakê pîrozî Kurdistan hate sipartin.
- * Di 6. 10. 1993 de Termên Bezanîyê Nemir ligel Idrîsê Xweşevist ji bona Kurdistana Jêrîn hatin veguhestin. Bi hezaran Sed hezaran Tudên Gund û Bajarê Kurdistanê çi li Kurdistana û Iranê û Iraqê de pêşwazî li Qehremanên Serxwebûna xwe dane kîrin. Li Kurdistana Jêrîn de di nava Dewleta Meyî Federalîyî Demokrasî de bi gelempêriya Gel ve û bi dil û cav ve hatin pêşewazîkirin.
- * Di 8. 10. 1993 de bi Ala Sêrengîn ve Xakê Bezanîyî perest Bezanîyê Nemir û Idrîsê Şêrîn Şêrîn Serxwebûna Kurdistana me di nava xwe de dane pêçan û poşandin û ew ji bona nava bextê Mejûwê dane hilanîn û spartin.

- Hezar silav li Canê bakê Bezanîyê Nemir be!
- Hezar silav li Yar û Dolsozêni wîyî Rêya Azadiya Bizava Kurdistanê bin!

(Ji bal Dr. Cuma ji Çapemenîyê Partîya Demokratî Kurdistan –Yekgirtî– hatîye wergerandin).

Berlin, di 18. Avada 1994 de.

Çima ev şerê navxweyî di nava Kurdistanê de tête kîrin?

Pir Kes vê pirsa giring ji xwe didin kîrin û dûr yanjî nêzîk ew bi hêsanî ve nikarin li ber bersiva vê pirsê de bêtin kevtin; ji ber ku ew him pir bi dujwar û tevlihev ve û him jî ew bi pirseke mêjûyi ve tête derkevtin û girêdan. Weha bi lênerîneke sadeyî xav û nezan ve dujwarîyên di nava wê de nikarin ji hev bêtin vekirin û hêjî bêtir ew nikarin bêtin liberkevtin.

Ev şerê navxweyî nihayî di nava Miletê Kurd de mîna piranîya şerên navxweyîyî Miletan hergav di encamê dawî de him li ser bidestxistina desthilatîyê bûn û himjî li ser şêweyî parvekirina hatina Milî de di nava çîn û desteyên cudayî de di nava civakê de dihatin vêkevtin. Hemû pevcûnên Civakî wisa têtin komkirin û nokirin, ku ew nema bi şêweyekî siyasîyî lêbuhurandî ve li ser berjewendîya Civak û Dewletê de dikaribûn bihatina çarekirin. Şerê Navxweyî mîna hemû şerekî din di mêjûwa Mirovanyê de siyaset bi rîyeke din ve tête derkevtin. Pir Milet û Dewletê bi nav û bang ve di mêjûwê de ji ser rûwê zemînê ji ber şerên navxweyî hatine kole û bedekirin, yanjî ew hatine hilanîn.

Werjî heger ku em hûr, kur û dûr ji dilbijandin û kînê ve ji xwe re temâseyî hoyêñ vêxistina vî şerê navxweyî niha bidin kîrin, dê emê bi hemû tirş û talîyan jî ve wan herdu hoyêñ jorî ji xwe re di vêxistina vî şerî de bidin dîtin.

Celalîyan bi hemû karinêñ xwe ve û nemaze bi saya hênzêñ xweyî çekdar ve dûr ji rîya demokrasiyê û dengdana milî di rîya vîna helbijartina wî de xwestin, ku ew bi darê zorê ve deshilatîyê û hatina Milî ji bona nava destêñ xwe û bes û bi tenha ve ji bona berjewendîya xweyî çepeli tesk ve bidin xistin. Çend dilbijandina Celalîyan nala Segê Pavilov ji bona wan herdu mebestan dihatin harkirin; wetovjî nobûnên dijbûnên wan ligel berjewendîyên tevaya civak û Dewleta kurdistanê de li binguhêñ hevdû de dihatin kevtin. Nobûnên wan dijbûnên hanê Celalîyan bi dadana şerê navxweyî ve dane vêxistin, ku niha di nava wî de pir derd, belayêñ mezin û giran bi ser Miletê me ve têtin kevtin. Hêjî bêtir tevaya dijbûnên civakî û hoyêñ lipaşkevtinê tevde bi hev re şerên xwe di nava vî şerên hanêyî navxwe de didin berzkirin û ew di encamê dawî de bi hemû tirş û talîyen xwe ve bi pêwistî û neçarı ve dê bêtin çarekirin. Belê hêjî bêtir ev şerê navxweyî tevaya Civaka me bi hemû dijbûn û paşkevîyêñ wê ve dide berbêjingkirin û ew nala hemû şerên navxweyî dûr yanjî nêzîk bi pêkanîna peymana Civakî ve tête dawîkirin, ya ku li ser bingehêñ wê de mana Dewletan û geşbûn û xweşbûna Civakan têtin hîmkirin.

Weha bi vî rengê hanê ve ev şerên navxweyî em di pir qonaxêñ cudan de di mêjûwa her Civak û Dewletekê de ji xwe re didin dîtin. Hin ji van şerên navxweyî ji mêj û hin jî ji demeke nedûr di nava hemû Civak û Dewletêniha de di mêjûwa wanî derbasbûyî de hatine vêxistin. Wehajî wan şerên navxweyî di nava van Civak û Dewletan de pir şopêñ xwînaviyî kûr ji golêñ xwînê û lodêñ serîyan li dû xwe de dane hîştin. Pir bajar û gund dane kavil û wêrankirin. Piranîya caran jî Dujminêñ wan Miletan agîre şerê navxweyî ji bona berjewendî û qazancêñ xwe dane vêxistin û himjî bêtir wan ew şerê hanêyî navxweyî didan geş û gûrkirin, yê ku pê ter û hişk di nava Welêt de dihatin şewitandin.

Hemû kîr, diyar û bi rîveçûna vî şerê navxweyî ve di nava Kurdistanê de, yê ku ew ji bal Talebanîyan ve hatîye vêxistin, di encamê dawî de li ser tirazûkirina hêzên kêrdar û besdar de bi pengizandina Talebanîyan ji nava Kurdistanê tête derkevtin; ji ber ku ev destê çeteyî çekdar bes û bi tenha ve nala sala 1964 careke din ji bona qazanc û berjewendîya Serdarîya Îranê didin karkirin. Ew bi şêweyekî Polpotîyî ve bi kîn û tol ve beramberî Rêbazê Berzanî û Kurdayetîyê didin karkirin û ew dixwazin vê Dewleta meyî Federaliyî perst bidin nabûdkirin.

Ev şerê navxweyî dê di mêjûwa xebata meyî siyasî de tevî hemû tirş û talîyen wî jî dê kêreke giranî mezin di xebata perçeyêñ dinî Kurdistanê de bide hîştin; ji ber ku bi dawîbûna vî şerê hanê û bi pengizandîn û malandina gemara Talebanîyan ji nava Kurdistanê dê xebata Miletê me bête biyekkirin û bi serkevtinê ve dê ew bête bi tac û xelatkirin.

Dr. M. S. Cuma

Selaheldin, di 1. 10. 1996 de

Çima cil û Şes Dîlêن Pêşmergêن partî bi şêweyekî hov dane kuştin?

Di 2o vê mehê de ez li paşnîvro de ji bona serdana bajarê Ranya çûm. Min dixwest bi çavêن xwe ve cihêن kuştina cil û şes pêşmergêن partiyêن dîlkirî ji bal Yekitîya Neştimanîyî Talibanî de di 14. 10. 1996 de bidim dîtin, gelo ma evaya wer rastbû?

Belê di nava baregeha partîya Yekitîya Neştimanî de Pêşmergêن Partiyî dîlkirî di bajarê Ranya de bi tivir û qazman hin ji Pêşmergan dane letletkirin û hinêñ din jî ji wan dane gulebarankirin.

Li ser ban de wan ew karêñ dir û hov dane kirin, da ku bi xwîna wan ve navê Partî ji ser arma bî derî vekirî ve bidin reşkirin. Hêjî arma navê Partî bi derî ve ye û him arma Partî, dîwarî xanî û hewşa baregeh tev bi xwîna kuştina pêşmergan têtin sorkirin.

Bi dîtina vê dîdara hanê bi lez û bez ve gelek bîrwerîyên mêmûyî di jîyana min de hatin derbaskirin. Min gelek cihêñ hovitîyê di nava welat û Miletan de ci di nava welatêñ rojhilat de yanjî di nava welatêñ rojava de dane dîtin; hîç cudabûna vî cihî ji wan cihêñ din nedihate kirin û hîç jî dirbûn û hovbûna vî karî ji dirbûn û hovbûna wan karan nedihate cudakirin.

Wer di mêmûwa Merovanyê de li seranserî cihanê de dir û hovîtî nala hevin. Hîç cudabûnek di nava wan de nayête dîtin.

Gelo bi vî rengê hanê ve kuştina Dîlêن Cengê ma ew ne li dijî hemû reweşt û rûniştinan têtin derkevtin? hêjî bêtir ma ev karê hanê ne li dijî peymana Cinêf de der sala 1925 de der barê Dîlêن Cengê de tête derkevtin?

Hîç gûman di vî karê dir û hov de ji bil tawankarîyêن Bokasa, Idî Emîn û Polpot pêve nayêtin dîtin. Tevaya bîr û bawerîya Kurdistanê û herwehajî bîr û bawerîya cihanê jî vî karê dir û hovî Yekitîya Neştimanî bi tawankarî dide danîn. Hêjî bêtir bîr û bawerîya Kurd û cihanê jî vê mîrkujîya Yekitîya Neştimanî nebes tenê bi tawankarîyê ve beramberî bi Kurd ve dide dîtin, lêbelejî hêjî bêtir ew vê tawankarîya dir û hov bi tawankarîya Rêberêن Yekitîya Neştimanî ve beramberî bi Mirovanyê ve didin danîn. Ev tawankarîya Yekitîya Neştimanî wan li seranserî Kurdistanê û cihana bajartî de bi hov û mîrkûj ve dide derxistin û bi çavekî pîrî nizim ve li van Rêberên Yekitîya Neştimanî didin temaşekirin.

Hîç rojekê ev karê hov ji mêmûwa me Kurdan nayête derkevtin, dê ew her û her nala rûpelekî reş û tarî di mêmûwa tijeyî Yekitîya Neştimanî de bi karêñ weha dir û hov di mêmûwa sî û du salêñ wan de neyête jibîrkirin.

Hîç gûman têde niye, ku dê cihê Talebanî û dam û darêñ wîna nala Bokasa, Idî Emîn û Polpot li ser sergovê mêmûwê de bête dîtin.

Dr. M. S, Cuma

Selaheldin, di 21. 10. 1996 de

Agirbestandin

Donê di demjimara 24 de agirbestandin di nava hêzên çekdariyî partîya Demokratî Kurdistan û Yekitîya Neştimanî Kurdistan de hate lidarxistin. Ev agirbestandina hanê li ser daxwazên pîr alîyan de hate kirin. Hîç gûman têde nayête dîtin, ku daxwaza agirbestandinê di nava Kurdistanê de ne bes tenê li qazanca herdu bendên şerdar de û herwehajî li qazanca aramîyê û aşitîyê de di heremê de tête derkevtin. Ev bestandina şer jî yekek ji giringtirîn û pêwestirîn daxwaza Gelê Kurdistanê bi giştî ve û daxwaza Gelê Kurdistana jêrin bi taybetî ve tête dîtin. Her Merovek, yê ku ew piçekî di siyasetê de tête liberkevtin, dizane, ku bes û bi tenha ve her pirsek wetov bi dijwarî û tevlihevîyê xwe ve bi şêwyekî aşitî ve û di rêya giftûgo de dikare bête çarekirin. Bi şer û ceng ve tanî niha hîç pirseke wetov nehatîye çarekirin; lêbelê her cengek hergav bi cengeke din ve hatîye aviskirin. Berjewendiya bilindî Miletê me li ser her layekî şerdar de dide neçarkirin, ku ew herdem dijwarî û pirsên xwe di rêya giftûgoyê de li ser bingehêñ hiş de bidin çarekirin.

Partîya me ji roja pêşiyî vî şerê vêxistîyî navxweyî ji bal Yekitîya Neştimanî de der 4. meha gulana sala 1994 de hergav ji bona bestandina wîna û çarekirina hemû dijwarîyan bi dilsozî ve û li ser kara Milîyi bilind de dayite karkirin; belam di tevaya agirbestandinan de Yekitîya Neştimanî bi bê şermî ve hêjî bêtir dijî qazanc û berjewendiya Welat û Miletê me ew dane şikendin. Hêjî bêtir hercar wan li paş her agirbestandinekê de şer û cengek gûrtir di nava Kurdistanê de dijî berjewendiya Dewleta Federaliya meyî perest didan dadan. Wan bi hemû çepelî û kotîbûna xwe ve weha didan bawerkirin, ku ew dê ji şikenandina wê agirbestanê ji xwe re sûd û kelk bidin wergirtin; lêbelê tevaya mêmûwa şikenandina agirbestan ji bal Yekitîya Neştimanî de hemşê bi ziyan wan ve dihate dawîkirin. Baştırîn nimûne şikenandina agirbestandinê der 16/17. 8. 1996 de tête derkevtin, ya ku bi rûxandin û bengizandina wan ve ji bona nava Îranê hate dawîkirin.

Partîya me vê carî jî bi dilsozî ve ev agirbestandina hanê dayite lidarxitin û ew dê bi hemû karîna xwe ve ji bona çarekirina hemû dijwarîyên li rastê de li ser bingehêñ lêbuhrandinê û hajbûna Milî de bide xebatkirin; ji ber ji vê rîyê baştir ji bona Welat û Miletê me rîyeke din pêve nayête dîtin.

Belam tevaya Mêmûwa Celalîyan ji sala 1964 de tanî vê roja me jî hergav berberîya beramberî Berjewendiya Welat û Miletê me tête derkevtin; hêjî bêtir nokerî û xwefiroşîya wan ji bona Dujminên me ji her kesî re tête diyarkirin; ji ber vê jî van Xwefiroşan der sala 1966 de nav û nîşana Caşîtiyê ji xwe re dane wergirtin.

Pirsa ku niha her kesek ji xwe re dide kirin, magelo dê Yekitîya Neştimanî vê carê jî vê agirbestandina hanê bide parastin? Magel ev Dest û Darêن Talebanî dikarin yanjî dixwazin di nava vê agirbestandina hanê de hemû dijwarî û pirsên li rastê de di nava xwe û Partîya Demokratî Kurdistan de li ser berjewendiya Welat û Miletê me de bi şêwekî aşitî û demokrasî bidin çarekirin?

Bersifa vê pirsa giring û pêst Merov dikare wer bide dan: ev agirê vî şerî Komarî Iranê bi Pasdar û çekêñ xwe ve ligel Hevalbendêñ xweyî Talebanîyan dane har û gûrkirin. Tevaya mêmûwa Miletê me ji pêla şerê çildêran der sala 1514 de tanî niha hergav Deweta Îranê bi xortî ve destdirêjî û çavşorîya xwe ji bona nava Kurdistanê dayite kirin û wê hergav Kurdistan bi meydana şer û golek ji xwînê ve dayite kirin. Tevî ku Miletê Kurd û tevaya bîr û bawerîya Cîhanê jî hêviya çarekirinek aşitî û demokrasî ji bona hemû dijwarî û pirsên li rastê de ji bona berjewendiya Miletê Kurd didin kirin, hîç nayête gûmankirin, ku dê Dewleta Îranê nala hercar bi hemû karîna xwe ve vê agirbestandina hanê li ser destê Çekdarêñ Talebanî de bidin şikenandin û ew dê careke din ji tevaya Cîhanê re rûreşîya Hevalbendêñ xweyî Talebanîyan bidin xuyanîkirin.

Dr. M. S. Cuma

Selaheldin, di 24. 10. sala 1996 de

Çima Iranê Celalî bi Pasdar û Topên xwe ve ji bona Kurdistanê dane vegerandin?

Şopeke xwînaviyê diyarî Iranî ji pêla Axmenî, Sasanî, Sefewî, Gecerî, Pehlevî û Komarî di nava mêtûwa xebata rewayî Miletê Kurd de tête dîtin. Rojekê ji rojan siyaseta Şahînşahiya Iranî û herwehajî pêrejî siyaseta Komara İslâmîyi Iranî jî bi dujmînatî û dirbûna xwe ve beramberî xebata Miletê Kurd di seranseri Kurdistanê de ji bona Mafeyê Milî mûyekî nehatîyê veguhertin. Ew ligel Dewleta Osmanî de û herwehajî li paş parvekirina Kurdistanê de piştî Cenga Cihanîyi Yekem de hergav bi peymanen siyasi yanji bi peymanen sipahî ve beramberî tevgera Miletê Kurd dihate rawestandin û di encamê dawî de wê ligel Dewletê Dagîrkerê Kurdistanê de ew tevgera hanê dida xistin; ji ber wêna di her bizaveke kurdîyî biçük de jî tirsa serhildana Kurdan ji bin koletî û bendîtiya xwe dida dîtin.

Wehajî nihajî li Kurdistanâ jêrin de piştî xebateke xwînaviyî dûr û dirêj bi saya Berzanîyê Mezin û di bin Rêberiya Partiya Demokratî Kurdistan de xewneke xweş piştî demeke tarî û dirêj di bin jêrdarîyê de bi pêkhatina Dewleta Meyî Federalîyi perest ve hate pêkhatin. Vê Dewleta hêviya tevaya Kurdistanê cerg û hinav li Talankerê Kurdistanê de date sûtandin û bingehê koletî û bendîtiya wanana di nava Welatê me de date hejandin û ji tevaya Dunyayê re bi rûxandina wê koletî û bendîtiyê date mujdekirin.

Dewleta Iranê niha jî mîna Şahê Ismaîli Yekemî Sefewî(1487–1524 Z.) ji dêlava ku ew dostanîyekê û hevkarîyekê li ser berjewendîya hevbesî de ligel Kurdan de bide durustkirin, wêna destêna xwe bi xurtî ve der sala 1964 de ji bona Talebanîyen Xwefroş date dirêjkirin, da ku ew di rîya van Xwefiroşan de Dewleta Federalîya hêviya jîna me bide nabûdkirin. Belam siyaseta Partiya Demokratî Kurdistanê rast û durust pîlanen Komara Iranî ji Miletê Kurd û herwehajî ji tevaya Bîr û Bawerîya Cihanê re date rûtkirin. Wêna pitsa Talebanîyan bi hêrişâ wan ve ji bona ser Kurdistanê date girtin û wê ew gemara Civaka me ji nûve careke din dane vegerandin, ji yên ku ew ji nava welatê me hatibûn pengizandin.

Iranê bi lez û bez ve bi Pasdar û Topên xwe ve Celalîyen Nokerê Kurdistanê xwe bi dû we ve ji bona nava Kurdistanê dane rakişandin, da ku ew zalbûna xwe nebes tenê ji bona ser Kurdistanê bidin durustkirin; lêbelêjî wê li ser tevaya İraqê de bidin zalkirin. Ev karê Iranê Rast û durust rûdanen mêtûyi pêla Ismaîlê Sefewî careke din ji me re bi hemû tirş û talîyên xwe ve û herwehajî bi hemû kûrbûna kîrên xwe ve di mêtûwa Kurd û Iranî de dide derxistin.

Pirsa ku niha Kurd û herwehajî Bîr û bawerîya Cihanê ji xwe didin kirin, Magelo dê ev siyaseta Iranîyi dilbijandî di rîya Talebanîyan de di Kurdistan û İraqê de bikaribe bête biserkevtin? Bersiva vê pirsê tevaya jana siyaseta Iranî di Rojhilata Navîni de û pêrejî di nava Kurdistanê de dide derxistin. Ev siyaseta ku ew di vî sedsalê me de ji nû ve dixwaze neqş û dewlemendbûna Rojhilat û Kurdistanê ji bona qazanc û berjewendîya Iranê bi darê zorê û hêjî bêtir bi devê tank û topan ve bide veguhertin. Em tev dizanin, ku ev siyaseta Iranê di cenga İraqî-Iranî de di 22. 9. 1980 de li paş heşt salên xwînavî de ne bi qazanca İraqê û nejî bi qazanca Iranê ve hate derkevtin; lêbelê wê cengê nebes tenê dewlemenbûn û hêza Merovanîya İraqê û Iranê date berbadkirin; lêbelê wê tevaya perişanî û rebenîya siyaseta van herdu Dewletê li paşvemayî de ji bona tevaya Dunyayê re date derxistin.

Bi vê siyaseta xwe ve Iranê bi piştîgirtina Celalîyan ve careke din mîna pêla Shah Ismailê Sefewîyi yekem der sala 1514 de hevalbendîtiya Miletê Kurd ji destêna xwe dide berdan û careke din dujmînatîya xwe mîna hercar ji nûve beramber bi Miletê Kurd ve dide xuyanîkin. Hevalbendîtiya Celalîyan ji bona wêrankirina Dewleta meyî Federalî û nemankirina Partiya Demokratî Kurdistan hîç gûman têde niye, ku dê ev karê hanê li ser Iranîyan de geleki di encamê dawî de bi kîrtir ve ji kîra pêla Ismailê Sefewî de bête derkevtin; tevî ku hemû merc û zinêtin niha û herwehajî bingehê hîş û berjewendîya Dewleta Iranê û Miletê Kurd dostanîyê di nava Partî û Iranê de jî dide pêwist û neçarkirin.

Dr. M. S. Cuma

Selaheldin, di 29. 10. 1996 de

Rêberên Qelp û Nezan

Di nava hemû Welat û Miletên li paşvekevtî de û herwehajî di nava Welat û Miletê me de newxeşîyeke civakîyi pir bi derd ve tête dîtin, ku ew pirbûna bêjimara Rêberên Qelp û Nezan di nava wan Welat û Miletan de ji bedbextîya nezanîya wan têtin peydakirin. Ew di nava hemû Partî, Sazmendî, Civat û Rêxitinê wan Welat û Miletan de li binguhêن hevdû de têtin kevtin. Werjî ev Merovên hanê di nava Civaka Kurdistana me de ji bedbextîya me jî pir bi pirbûn ve tête dîtin. Ev hebûna van Merovan bi vê pirbûn û belavbûna wan ve nişaneke pir tirş û tal ji netêgihiştina giştîyi û sarbûna lipaşvekevtina Civaki ji me re dide derxistin.

Di Civaka Sedsalêن tarîyi Navînî de di seranserî Ewropa de Merovên pirî Rêberên Qelp û Nezan di nava wan Civakên Ewropî de dihatin pirkirin û peydakirin. Di tevaya mêtjûwa Ewropa de di Dema Sarkirin û tarîya Sedsalên Navînî de ev gemara Civakê di nava dam û destgehêن wan de dihatin peydakirin. Hergav di wê Dema Sarkirin û tarîya Sedsalên Navînî de wan Welat û Miletan pir derd didan hilgirtin û wan golên xwinê didan dagirtin. Şer û Cengêن pir giran û wêran di nava Bajar û Gundêن wan de ji bona berjewendîya wanî pir sade û xav dihatin vêxistin. Bajar û Gund dihatin talan û wêrankirin û wan bi vi rengî ve Yek ji sisêyan ji pirbûna kuştina Neşîvanêن xwe ve dane windakirin.

Wetov bi neçarî ve Ewropa di wê pêla mêtjûyî de mîna Welat û Miletên li paşvekevtîyi niha de tûşî wan Rêberên xweyî Qelp û Nezan hatibûn kirin. Hebûn û mana Wan Miletan ji destêن Rêberên wanî Qelp û Nezan bi ber metirsiyê ve hatibûn kevtin. Di bin mercen metirsiyî mêtjûyî wişa de bi neçarî ve Şiyarvan û Remangîrêن Dema Vejandinê di nava Welat û Miletê Ewropî de li ser bingehê Felsefa Kilasîkiyî Yunanî de, ya ku ew bes li ser bingehê hiş de tête hîmkirin, hatin peydakirin. Wan Şiyarvan û Remangîran bi mérxaşî û gernasî ve bîr û bawerî û remanêن Dema Vejandinê beramberî wan Rêberên Qelp û Nezan di nava Welat û Miletên xwe de dane belavkirin. Wan bi van karêن xwe ve berêن hemû şer û cengan di Civaka xwe de ji şerîn Rêberên Qelp û Nezan bi şerê di navbera tarî û ronahîyê de, bi şerê Gelêrî ve beramberî bi Rêstika Derbegeyî Sedsalê Navînî de datin veguhertin. Pir şerîn wan Rêberên Qelp û Nezan nala gogân li ber kaşoyêن Remanêن Dema Vejandinê hatin berbadkirin. Ev Dema Vejandinê di Seranserî Ewropa de di 14. tîrmeha sala 1789 de di Şûresa Firensiyî pîroz de hate bitac û xelatkirin. Wetov di encamê dawî de Şûresa Firensî bi bîr û bawerîyêن xweyî Merovaniyî bilind ve tevaya Ewropa ji Rêberên wêyê Qelp û Nezan date malandin. Ji wê roja pîroz de Welat û Miletê Ewropa roj bi roj ve û hêjîbêtir tanî vê roja me jî hergav ber bi pêşveçûn û pêşveketinê ve bi xurtî ve tête çûyîn, ku tevaya Miletê Ewropa dûr yanjî nêzîk xwe di qonaxa pêşvekevtina Merovaniyî niha de didin dîtin, yên ku ew her dem dibêjin: sal bi sal ve xwezî bi îsal ve.

Pirsa ku niha xwe bi neçarî ve ji me dide kirin, Magelo tanî kengî dê ev Welat û Miletêni li paşvekevtî de û herwehajî Welat û Miletê me jî xwe ji van Rêberên Qelp û Nezan bidin rizgarkirin? Bersiva vê pirsa sade, belam pir giran bes û bi tenha ve Merov dikare wê ji serpêtiyêن mêtjûwa Miletêni Ewropî de di Dema Vejandinê de bide derxistin û hêjîbêtir werjî wê bidin bersivkirin; bê ka wan Miletan di wê qonaxa mêtjûyîyî giring de çî ji xwe re dabûn kirin, werjî dûr yanjî nêzîk jî ev Welat û Miletêni li paşvekevtî de û herwehajî Miletê me jî divê wê rîya pîrozî Dema Vejandinê bi lez û bez ve û hêjîbêtir bi xurtî jî ve ji xwe re bide girtin, da ku ew ji van bedbextîyêن nezanîya xwe bêtin rizarkirin û tevaya Civakên xwe ji gemara van Rêberên xweyî Qelp û Nezan bidin paqikirin. Ev Rêberên Qelp û Nezan ji nava Civakan bi neçarî ve tête kat û derkevtin; belam çî gava ku têgihiştin û şiyarbûna giştîyi Miletêkî li ser zemîna Dema Vejandinê de bêtin hîmkirin û ew li ser zanistî û zanebûna Merovaniyî niha de bêtin bipêşvexistin, wê hingavê Welat û Milet ji Rêberên xweyî Qelp û Nezan tête rizgarkirin û ew nala Welat û Miletêni pêşvekevtî cihêن xwe di nava pêşvekevtina Civaka Merovanyê de ji xwe re didin girtin. Werjî dê Miltê Kurd jî di nava Dewleta Kurdistana xweyî Millî de bi bektîyarî û xweşî ve bête jîyandin. Ew jî dê mîna Miletê dinî pêşvegevî bide gotin: Sal bi sal ve xwezî bi îsal ve.

Dr. M. S. Cum

Selaheldin, di 10. 11. 1996 de

Pêşmerge

pir di mêtûwa meyî nuh de, belê di dema serhildana Milî de vê peyva hanê cihê xwe roj bi roj ve di nava dilê Miletê me de di seranserî Kurdistanê de dayite girtin. Roj bi roj ve bêtirji ev nav xwe di nava bextê Kurdan de dide rapêçandin û ew bi nişa liberxwedana Miletê Kurd ve ji bona serxwebûna Kurdistanê bi saya dilsozî, vîn û evîna wanen ji bona hebûna Milî tête derkevtin.

Di mêtûwa zimanê me de hîç peyveke wetov bi lez û bez ve ji bal hemû Neşîvanê Kurdistanê wer nehaîye dildarî û evîndarîkirin. Cerg û hinavên Miletê me ligel Pêşmerge de ji bona azadî û serxwebûna Kurdistanê têtin lêdan. Bi vî navê pîroz ve nîşana hebûna me û nîşana mirovanîya me di nava Civaka me de pê tête sitirandin û Kecen şepalên qesengên ciwanen nazenînê Kurdistanê ji bona pêşwazî û dîtina Pêşmergan bi cil û bergên xwe ve, bi zêr, zîv û xişrên xwe ve û bi taca gulên ser serên xwe ve xwe didin xemilandin.

Rûmeta Kurd, nav û nîşana wîna, azadiya wîna, serxwebûna welatê wîna, belê rizgarkirina wîna ji bin koletî û bendîtiya Rom, Ereb û Ecem bi carekê ve bi saya û qehremanîya Pêşmerge ve tête bicikirin.

Di tevaya jîyana Miletan de di seranserî mêtûwa wan de bes û bi tenha ve bi saya hêza çekdarî ve hebûna Miletan û serxwebûna Dewletan têtin parastin û ew ji bindestiyê û bendîtiyê têtin rizgarkirin. Tevaya Dewletan di vê dunya me de hemû bes û bi tenha ve li ser bigehê hêza çekdarî de hatine durustkirin, lêbelê mana wanen li ser bingehê hiş û dadwerîyê de têtin dirêjkirin. Wetov bi vî rengî ve tevaya Remangîren Dewletê di dema Vejandinê de ji me re didin axivtin.

Dagîrkeren Kurdistanê bi darê zorê ve û bi Sipahên gurên devbixwîn xwe ve tevaya serhildanen me didan tar û markirin. Wan ne bes tenê dewlemenbûna Welatê me ji xwe re didan talankirin; lêbelêjî hêjî bi ser ve jî wan em didan kole û bendekirin, Kurdistanâ meyî ciwan buhuşta ser zemîna me didan kavil û wêrankirin, ziman û mêtûwa me, ayîn û peresten me bi evsan û gemarên xwe ve ji me re didan veguhertin. Wetov demeke pirî dirêj di nava tarîya demê de Miletê me di nava Kurdistanâ xwe de bi bê hiş û mêtû ve, gêl û gêj bê xwedî û xwedan dida jîyandin.

Pêşmerge Pehlevanen Kurdistanê durujmê jîyana me li ser desten Berzanî de ji tevaya dunyayê re durujmê Kurdistan yanjî neman dane berz û balakirin. Bi vî durujmê pîroz û perest ve rûpelekî nûhî pir bi geş û hêvî ve di mêtûwa xebata me de ji bona rizgarkirin û serxwebûna Kurdistanê di nava tevaya cerg û hinavên Miletê Kurd de hate destpêkirin. Rêya azadîyê, rêya dema vejandinê, rêya serxwebûna Kurdistanê û rêya pêkhatina Dewleta Milî bi saya vî durujmê Pêşmergen me roj bi roj ve tête rast û textkirin.

Di mêtûwê de gelek Miletên mîna me ci di rojhilat de û ci jî di rojava de ew jî bi saya hêzen xweyî rîexistiyî sipahî ji bin desten Zordarên xwe ve hatine rizgarkirin; jibervêjî wan Miletan hêzen xweyî Sipahî mîna reşekên çavêن xwe hergav bi merdayeti didin perwerdekirin, xwedikirin û parastin. Hêjibêtir beşê herî mezîn ji hatina Milî ji bona hêza Sipahî û pêşkevtina wî di hemû waran de tête tirxankirin, da ku ew hêza Sipahî bi başî ve bikaribe li ber parastina sînorên Dewleta xwe de ji destdirêjîya her Çavşorekî bide kirin û hêjibêtir nebes tenê hêzen çekdaryen wî Çavşorî di nava Welatê xwe de bide tar û markirin, lêbelêjî hêzen wî Çavşorî di nava Welatê wî de jî bide nabûdkirin û wî Çavşorî û welatê wî wetov bide fêrkirin, ku ew careke din ji bona xwe û herwehajî ji bona Çavşoren din jî bi serpêtiyeke pir tirş û tal ve bête derkevtin, ku tucarî Kesek wê mîrxasîyê di xwe de ji bona destdirêjîya ser welêt de nema wêribe bide kirin.

Ev Pêşmergen Kurdistanê Lehengen Midya vane bi xwîna xwe ve him mêtûwa Welatê me ji bona serxwebûnê dêr bi dêr ve didin nivîsandin û himjî ala Kurdistanê hêviya hebûn û jîna me li ser ban û zinaran de didin berz balakirin.

Cihê Jinan di nava Civaka Kurdistanê de

Miletê Kurd di seranserî dirêjbûna mêtjûwa xwe de mîna hemû Miletên Rojhilat di pir qonaxêن cudayî hilat û dahatêن pêşvekevtinê de hatîye derbaskirin. Di nava van qonaxêن mêtjûyî de cih û rola Jinên Kurdistanê hergav ji me re bi diyarî ve têtin dîtin. Ji bona nimûne cih û rola Jinên Kurdistanê di nava xebata Miliyî xwînavî de em tevde bi serfirazî ve wan didin dîtin. Hêjibêtir Jinên Kurdistanê Zarok û Menalêن xwe bi şîrên evîndariya Kurdistanê û azadiya wêna didin bipêşirkirin û ew wan bi canê kurdîniyê û Merovanîyê ve didin perwerdekirin. Dêyêن Kurdan bi mîrxasî ve, bi gernasî ve û bi merdayetî ve bi hezaran sedhezaran ve ji Kec û Xortêن xwe ji bona Serxwebûna Welat û Miletê xwe didin gorîkirin. Ew beramberî tevaya Dunyayê dara azadîya Kurdistanê bi xwîna pakên şêrinê berdilêن xwe ve didin avdan. Dibustana Kurdayetîyi bi kîr û herî gewre ve li nik Jinên Kurdistanê de tête peydakirin. Ev Dibustana jîyanê tevaya serdariya Dagîrkeran di nava Welatê me de dide hejandin û ew wê di encamê dawî de dide nabûdkirin.

Miletê me jî mîna hemû Miletên vê Dunyayê pêşvekevtina wîna bi pîvana pêşveketina jînan ve di nava wî de tête dîtin; jibervêjî divê şev û rojê Rêberên Kurdistanê bi çavekî pirî bilind û hêja ve ji bona pêşvekevtina Jinan di nava Civaka Kudistanê de bidin temaşekirin û hêjibêtir pir bi guhpêdneke giring ve ji bona bilindkirina asûyê zanebûna Jinan di nava Welatê me de bidin xebatkirin.

Di nava Civaka Kurdistanê de Jin bêtir ji nîvê wê didin pêkanîn, yên ku ew di bin barêن giranî hêza reweşt û rûniştinê kevnar de têtin xûzkirin. Azadikirina Jinan ji bin nîrêن van hêzên paşkevtî bi neçarî ve bi erkê tevaya Civakê ve tête derkevtin, heger ku ew bixwaze xwe ji tarîya sedsalêن navîniyî dirêj de di bin bendîtiya Rom, Ereb û Ecem de bide rizgarîkirin. Rojekê ji rojan bêyî rizgarîkirin û şiyarîkirina Jinên Kurdistanê emi tucarî nikarin xwe ji bendîtiyê, bindestiyê û perişanîyê bidin rizgarîkirin. Pirsa azadîkirina Jinan ji bendên sedsalên navînî nebes tenê bi karekî Merovanî ve tête dîtin; belam hêjibêtir ew bi karekî Civakî û Welatiyî pirî giring ve û ew bi bextiyarîya tevaya Miletê me ve tête girêdan. Miletik di vê Dewleta Dunya me de nikare bi xwesî ve di nava civaka xwe de bête jîyandin, heger ku ew Jinên welatê xwe mîna Peyan di kar û barên pêşvexistina Civaka xwe de nedîn besdarîkirin.

Xebateke pir giran û mezin di nava Civakêن Ewropî de him ji alîyî tevaya Şiyarvanêن wan de û herwehajî pêrejî Tevgerek Jinan ji bona Mefeyêن wan bi xurtî ve di nava Welatên Ewropî de hate vêexistin û dadan. Di encamê vê xebata dijwar û giran de Jinên Ewropî bi mafeyêن xweyî Civakî ve hatin xelatkirin, yên ku ew iro pê bi sefirazî û bextiyarî ve di nava Civakêن xwe de titên jîyandin. Herwehajî hêjibêtir beşekî pirî giring û giran ji pêşkevtina Civakêن xwe wan ji bona ser milêن xwe dane hildan. Merov dikare rast û durust bide gotin, ku pêşkevtin û bextiyarîya her Civakekê bi pêşkevtin û bextiyarîya Jinên wê Civakê ve têtin girêdan.

Xebata Jinên Kurdistanê him ji bona mafeyêن wan û himjî ji bona bêtirbûna besdarbûna wan di pêşvexistina Civaka me de divê ew ji bal hemû Kesên Welatperwer bi dil û can ve lêbête piştgirtin, da ku Civaka lipaşvekevtîyi Kurdistanê xwe ji vê tarîya bendîtiya Rom, Ereb û Ecem bide rizgarîkirin û hêjibêtir da ku ew xwe bi lez û bez ve bi Civakên pêşkevtî ve di vê Duyayê de bide gihaştin, da ku em jî mîna hemû Miletan di nava Welatê xwe de bi gesî û xwesî ve bêtin jîyandin. Édî bes dewlemendbûna Welatê me bête talankirin û biserdejî nema édî em bêtin kole û bendekirin.

Çend em ji bona mafeyêن jînê Kurdistanê di nava Civaka xwe de bidin xebatkirin, deha weha em ji bona xweşbûna jînê û bextiyarîye di nava Civaka xwe de didin karkirin. Ev rastîya hanê ji serpêhatîya hemû Miletên Ewropî divê hergav li ber çavên me de bête dîtin; ji ber ku yekek ji bingehêن remanêن giringî dema venjandinê di gihadina Jinan de ji bona mafeyêن wan dihate dîtin.

Pirsa ku em niha Kurd ji xwe didin kirin, bê ka çawan û çilo divê em bi başî ve ligora zînet û mercen pêşkevtina Civaka Kurdistanê de pişta xebata Jinên Welatêن xwe ji bona mafeyêن wanîyî rewa û pêwist bidin girtin.

Bîranîna mirina Barzanîyê Mezin û Idrîsê Ciwanmerd

Di 1. 3. 1979 de Barzanîyê Mezin ji vê dunya hanê ve pişî xebateke dûr, dirêj û bi kêt ve di xebata welaflî de bi herdu milên xwe ve di warî milî û civakî de date bikoçkirin. Pêtir ji nîvsed salekî ve wî di xebata xwînaviyî Kurd de date bikerkirin û ew di seranserî cihanê de bi navê wî ve dihate bigirêdan.

Barzanî û Barzanîyan di dema xwe de ji Şêx Ebdu-Selam, Şêx Ehmed û Barzanî ve xebata miletê Kurd bi şêweyekî nuh ve him di warêن civakî û milî de û himjî di warêن pêwendiyêن derve de li ser tevaya serpêhatiyêن miletê Kurd û tevaya serpêhatiyêن miletê din de di xebata wanî azadîxwaz de dane bihîmkirin. Wan ala xebatê bi mîrxasî û gernasî ve di dema ketinê mêjûyi giranî xwînavî û bêhêvîbûn de datin biberzkirin. Tevaya miletê Kurd li seranserî Kurdistanê de bi berzbûna nav û nîşanên Barzanîyan ve dihatin bişakirin û bi serxwebûnê ve dihatin bîhêvîkirin.

Hemû şûreşen wan ji pêla Şêx Ebdu-Selam de her û her ew ji bal hemû Xelkêن Kurdistanê ve di herçar perçen wê de bi dil û can ve dihatin bipiştgirtin.

Yekek ji gewretirîn şûreşen Kurd ve di şûreşa 11 ilonê de di sala 1961 de tête biderkevtin, ya ku ew li jêr rîberiya Mustefa Barzanî de dihate birêvebirin.

Barzanî li jêr hemû zînet û mercen dijwar jî de roj bi roj ve şûreş ber bi serkevtinê ve didate biajotin. Wî dosten wê di seranserî dunyayê de didatin bipirkirin û Dijminên Kurd li seranserî cihanê de didatin birûsar û birûreshkirin. Wî navê Kurd û Kurdistanê li her der û cih de didate binaskirin û hemû buxtan û bêbextiyêن Dujminên Rom, Ereb û Ecem datin bitarûmarkirin.

Tevaya siyaseta Barzanî û Barzanîyan ji bona serxwebûna Kurdistanê ve li ser felsefa Xanî û serpêhatiyêن xwînaviyî Kurd di seranserî mêjûwa wî de dihate bicingehkirin. Tevaya cewhera siyaseta wan li ser sê bingehan de dihate biavakirin: 1. Dûr ji kînê ve, 2. Dûr ji dilbijandinê ve û 3. Li ser bingehê lêbuhurandinê ve.

Barzanî daxwazên wî her û her ji biçûk ve ber bi mezin ve didatin bibilindkirin û di encamên dadwî de ew di peymana 11 Avdarê de di sala 1970 de hatin bitac û bixelatkirin, ku têde bi şêweyekî demokrasî ve pirsa Kurd li ser berjewendîya Kurd û Ereb de di nava Komara Iraqê de hate biçarekirin. Lîbelê Serdarên Iraqê ew peymana Mêjûyi dane bikuştin û di sala 1974 de şerekî sext û dijwar li ser Kurd de dane bivêxistin. Barzanî ligel hemû miletê kurd de di Kurdistana Iraqê de bi mîrxasî û pehlewanî ve li ber hêrisen Basîyan ve hatin birawestandin. Belam di encamê dawî de li ser pîlaneke navdewletî de li ser peyamana Cezair de di 6. Avdara sala 1975 de di navbera Şah û Sedam de şûreşa Kurdî mezin hate birûxandin.

Barzanî bi armancêن xwe ve nehate bigihandin; lîbelê wî vêkevtina şer û cengê di navbera Iranê û Iraqê de date bidîtin û bi rastî jî ve şer û ceng di 12. 9. 1980 de tanî sala 1988 de date bidirêjkirin, ku têde 1,5 Merov ji herdu alayan ve hatin bikuştin.

Di piştî mirina Barzanî de Idrîs û Masud ala xebatê li ser rîbazê Barzanî de ji bona ser milên xwe ve bi dilsozî û zanebûn ve dane bîhildan. Idrîs roj bi roj ve serpereştiya şûreşa Golânê bi hêdî û nermî ve û pir li ser xwe de dûr ji nexwşiyên zarotiyê ve didate birêvebirin. Roj bi roj ve şûreşa gulanê bi saya wê siyaseta rastî durust ve dihate bipêşkevtin û wê cihê xwe bêtir û bêtir di nava dilên miletê xwe de û di nava xebata rizgarî de didate bixurtkirin. Idrîs bi xwedan serpêhatîyeke mezin û gewreyî şûreşa ilonê ve dihate biderkevtin. Wî zû Rêberêن Qelp û Nezan didatên binaskirin û hêjibêtir ew pir bi jîr ve dihate biderkevtin. Dan û sitendinên wî legel Pêşmergê Kurdistanê û hemû Beşdarêن nava şûreşê de bi nimûne ve dihatin biderkevtin. Dost û Dujminên wî rêz û hêjabûn lê didatin bigirtin. Ew gelekî li ser taktilka siyasî de bi jîr û zal ve dihate biderkevtin. Kêm kes mîna wî di nava Kurdan de wetov di livandina siyasî de ji bona gihadina armancê ve bi kêmterîn gorî û kurttirîn dem ve dihatin bilberkevtin. Ev hozanê taktilê di siyasetê de desten Cangêşê merinê zû bi zû ve pê hate bigihandin û wî ji nava Xizim û kesen xwe ve, ji nava Heval, Dost û Pêşmergê Kurdistanê ve di 31. 1. 1987 de date bibarkirin. Wî cihekî valayî pir mezin li dûxwe de di nava xebata Partî de date bihiştin. Gelekî hemû Dost û Hevalen wî bi mirina wî ve hatin bidilşikenandin; jîber ku wî cihekî pir giring û giran di nava xebata miletê xwe de date bivalahiştin.

Iro gava ku em bîrwerîya Barzanîyê Qehremanê miletê Kurd û Idrîsê Ciwanmerd didin bibîrxistin, em bîrwerîya tevaya Gorîvanê Kurdistanê li ser rîya azadiyê, serxwebûn û pêşkevtina Kurdistanê de didin bibîrxistin. Herwehajî pêrejî em bi bîrxistina gorîvanîya Feranso Herîrî jî ve di nava van çend rojên çûyi de li ser desten Mergujan de didin bibîrxistin û em vî karê mîrgujîyi tirsonek bi hemû tûrebûn ve didin bitawankarkirin.

Herbijî yadê Barzanîyê Nemir, Idrîsê Ciwanmerd û hemû Gorîvanê Kurdistanê

Dr. M. S. Cuma Berlin, di 1. 3. 2001

Pêşgotina Werger

Xwendevanê hêja û berêz!

Bi dilxwesi û bextiyarî ve ez li ber destêن we de vê wergerandina Şerefname Şerfxanê Bedlîsî didim bidanîn. Ev jî bi karekî bicûkî xewnen zarofiya min ve tête biderkevtin. Ez dizanim, dê kur û kêmaniyêن vê wergarndina hanê bêtin biderkevtin; jibervêjî ve ez hêviya lêbuhurandinê ji Rexnevan û Rexnegîran ve didim bikirin. Ez hêvidarim, ku di wergerandinê din de dê kur û kêmanî bi kêmtir ve bêtin bidîtin.

Berî vê wergerandina hanê di sala 1856 de Mele Mehmudê Bayezîdî ew ji bona zimanê Kurdî ve bi Zaravayê Kurmancî ve dayîte biwergerandin. Ev destnivîsta hanê li nik min de tête bidîtin. Min nikarîbû jê sûd ji xwe re bide biwergirtin; jiber ku pir gotinêن Erebî di nava wê de dihatin biderkevtin û hêjibêtir ew bi dest ve hatibû binivîsandin û min pir dujwarî di xwendina destnivîse de didate bidîtin.

Di 12 meha rojîya sala 1367 koçî de beramberî 19. 7. 1948 zayînê de Mohamed Elî Ewnî Şerefname ji bona zimanê Erebî dayîte biwergerandin. Min ji vê wergerandina hanê ve pir sûd ji xwe re dayîte biwergirtin.

Herwehajî wergeradnina Mele Cemîl Bendî Rojbeyanî bi zimanê Erberiyî çapkiri ve li Begdadê di sala 1953 de di nava destêن min de dihate bidîtin. Min ji vê wergerandina hanê jî ve pir kar ji xwe re dayîte biwergirtin.

Di sala 1972 de Şerefname ji bal Hejar ve ji bona zimanê Kurdî zaravayê soranî ve hatîye biwergerandin û ew di sala 1973 de li Necefa Eşref de li Iraqê de hatîye biçapkiran. Herwehajî ji vê wergerandina hanê jî ve min ji xwe re kar dayîte biwergitin; tevî ku jî di vê wergerandina hanê jî de pir derçûn ji rêzanên wergerandinê zanistî ve têtin biderkevtin.

Wergerandina bi zaravayê kurmancî ve ji bal Zîya Avcî ve di sala 1997 de bi derengî ve di havîna sala 2001 de bi destêن min ve hate bikevtin. Min jê kêm şûd ji xwe re date biwergirtin; jiber bigir wergerandina min di dawîya xwe de dihate bidîtin.

Min bingehê wergerandina xwe li ser Şerefname Farsiyî çapkiri Tehran –dîmahê 1343 Xorşîdî (Hicrî) de ji bal Mohamed Ebas ve dayîte bidanîn.

Her Mervokî, yê ku ew vê nivîsta hanê dide bixwendekarîkirin, ji xwe re tevaya zanistî û zanebûna Şerefname Bedlîsî di zanistîya mêtûwê û baştirîn şêweyê nivîsandina wê de dide bidîtin. Şerefname Bedlîsî bi yekekî ve ji gewretirîn Nivîskarêن Mêtûwê ve di rojhilat de tête biderkevtin. Wî şêweyê nivîsandina mêtûwa Rojhilat ji bingeh ve date biguhertin. Wî mêtû ji evsan û çirokan ve û ji sêweyê nivîsandina mêtûyî Rojhilatî ve date birizgarkiran. Dibustanêن Mêtûyî nuh di Ewropa de û bi taybetî ve Elmanî bi dûr yanjî nêzîk ve bi vî şêweyê hanê ve mêtûwê didin binivîsandin û wetov jî lê didin bitemaşekirin.

Vî Gewreyê Hozanê mêtûwê tevaya zanebûna xwe di demeke nîşankiri de bi şêweyekî zanistî ve ji bona nivîsandina mêtûwa Kurd ve date bitirxankiran. Wî ronahîyeke pir ji bona ser mêtûwa Kurd, welatê wî, civaka wî û cihê wî ve di rojhilata navîn de date biavêtin. Tevaya Zanistvanên mêtûwa Kurdistanê dikarin pişa xwe bi kanîyen wî ve bidin bigirêdan û ew jê pir sûd ji xwe re bidin biwergirtin, ji yên ku ew bi berî çarsed salî ve hatine binivîsandin.

Ez hêvidarim û hêjibêtir bendewarim, ku dê Kurd ji her roj bêtir ve ji xwe re li vî karê Şerefname Bedlîsî de bidin bitemaşekirin û jê serpêhatîyêن giring û giran ji xwe re bidin biwergirtin.

Mêtûwa me ji pêla Musulmatîyê ve bi cila buhuşta evsana Ereb ve hatibû bipoşandin. Hêjî Dujminên me him me ji zimanê me ve, himjî ji mêtûwa me ve, himjî ji dewlemendbûna welatê me ve û hêjibêtir ji mirovanîya me ve didin bitalankiran. Wan didatin bixwestin, ku ew di bin navê Musulmantîyê de me bidin bibijavtin û bi mîna miletékî ve bidin biwindakiran.

Miletê, yê ku ew xwe, mêtûwa xwe û zimanê xwe dide binaskiran. biparastin û bipêşvexistin, nikare bête biwindakiran û binemankiran.

Ev miletê Kurd, yê ku ew ji pêla Somerî de ji berî pênc hezar sal ve di nava Kurdistanâ xwe de tête bijiyandin, li ser destê çepelên Rom, Ereb û Ecem de nayête biwindakirin, dê ew bi serxwebûna xwe ve bête bitac û bixelatkirin û dê ew bi darê zorê ve û bi hinera qanûnên jînê ve bi gîsnekî ve di nava nîvîn çavêwan de bête biderkevtin.

Ez dixwazim li vê derê de tevaya sipasîya xwe ji bona Fewzî Ased ve bidim bipêşkeşkirin; jiber ku bi saya serê wî ve ev nivîsta hanê û tevaya nivîstên minî din jî hatine birastkirin.

Herwehajî ez hêvidarim, ku dê ji vî karê hanêyî biçük ve Keç û Xortê Kurdistanê jê sûd ji xwe re bidin biwergirtin.

Min tanî neha ev nivîstên hanê dane biwergerandin û binivîsandin û min ew bi şêweyêngapkirinê yanjî sêlikan ve dane bibelavkirin, ew jî evin:

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1931-1958
Mesud Barzanî

Barzanî û Tevgera Azadîxwazîya Kurd
1958 - 1961
Mesud Barzanî

Kurtîyeke Mêjûwa Kurd û Kurdistanê
Ji Destpêkirina Mêjûwê Tanî vê Rojê
Mohamed Emîn Zekî Beg

Mêjûwa Dewlet Û Mîrneşînîyêndi Kurdi Pêla Musulmantîyê De
- Bergê Duwem Ji Kurtîya Mêjûwa Kurd Û Kurdistan -
Mohamed Emîn Zeki Beg

Pirsiyarîya Kurd
Mêjûwa Kurdan û Neha Wan
(Civata Xweyîbûnî Kurdiyî Welatperwer)
-Belavoka Pêncem -
Dr. Bilîc Şîrkoh

Kurd
Rûnkirin û Dîtin
Kurd Nevîyêndi Midîyan
V. F. Mînoriskî

Kurdistana Turkî di Navbera Herdu Cengan de
Profisor A. Hesretyan

Der Barê Sitrafîciya Siyasî û Sipahî ya
Tevgera Welatîyî Kurd
-Temaşckirinek ji bona Mêj û Neha, herwehajî yekeke din ji bona Ayinde jî de-
Dr. Ismet Şerîf Wanlî

Zanistîya Mêjûwê li Ewropa de, Felsefa wê, Şêweyê wê, Pêşkevtina wêna, Rûnkirinê li ser
Mêjûwa Kurdistanê û Dîroknivîsandina Rojhilatê de
Dr. Ismet Şerîf Wanlî

Tevgera Kurd di serdema nuh û neha de
 Akadimiya Zanistîya Yeketîya Sovyêtê û Akadimiya Zanistîya Ermeniya Sovyêtê; Mosko, di
 sala 1987 de

Mîr
 Nikolo Mikavili

Peymana Civakî
 Jean-Jacques Rousseau

Pêşkevtina Sosyalistîyê ji Otopîyê tanî Zanistîyê
 Friedrich Engels

Rola Kar di Veguhertina Meymûnan de ji bona Merovan ve
 Friedrich Engels

Manîfesta Partîya komunist
 Karl Marx - friedrich Engels

Derbarê Mafeyê Netewan di Nîşankirina Çarenûsa xwe de
 Lenin

Sê Kanî û Sê Pêkhatinên Markisistîyê
 Lenin

Zîneta Zimanî di nava Heremên Kurdî de
 R. I. Tissabolov

Li ser rîya azadiya Kurdistanê de
 -Çend bîr û bawerî li ser hin rûdanêni siyasîyî de ji sala 1956 - 1975 de-
 Dr. M. S. Cuma

Sî sal mîjûwa Komela Xwendevêni Kurd li Ewropa de
 Dr. M. S. Cuma

Li ser tirba Şêro de
 Dr. M. S. Cuma

Dr M. S. Cuma

Berlin, Mahlsdorf, di 23. 4. 2002 de

Cih û kîrêne şûreşa Ilula mezin di nava bextê mêtûwa me de

Di mêtûwa kurdistanê de ji pêla parvirkirina wê de di sala 1514 de di nava Selteneta Osmanî û Şahînşahîya Iranî de gelek raperîn, serhildan û şûreşen xunavî hatin bikirin û hemû di encamê dawî de li ser desten Serdarên hovberên Rom, Ereb û Ecem de bi hovîfi ve hatin bikevtin. Tevlivêjî de miletê Kurd di mêtûwa xweyî dirêj de ji pêla mêtûwa Somerî de ji berî pênc hezar sal û pê de serên xwe ji bona Dagîrkerên Kurdistanê ve nedabûn bitewandin. Yek li du yên din de ji nava welatê xwe ve dane bipengizandin.

Di parvekirina Kurdistanê de di cara duwem de li ser bingehê peymana Sayks-Pîko de di sala 1917 de di piştî cenga cîhanî yekem de ji nû ve Kurdistanâ li jêr deshilatîya Selteneta Osmanî de di nava Turkî, Surî û Iraqê de hate biparvekirin. Kurd ji benden 62, 63 û 64 Peymana Sêver ve di sala 1920 de û di piştî cenga cîhanî duwem de bi herifandina Komara Mehabad ve di sala 1947 de bi destvalan ve hatin biderkevtin. Di vê pêla koletî û benditiyê de li jêr serdarîya Rom, Ereb û Ecem de tanî sala 1961 pir raperîn, serhîlandan û şûreşen xunavî ji neçarî ve hatin bivêkevtin; belam tevde bi dirindane ve hatin bivemirandin û miletê kurd bi bêhêvitî ve, bi bê xwedî û xwedan ve, bi bêmafe ve û bi kole û bend ve di nava Kurdistanâ xwe de dihate bijiyandin û dewlemenbûna Kurdistanê bi carekê ve dihate bitalankirin.

Di nava van tarîyê dema mêtûwa me de Barzanîyê Mezin, Lehengê evsana azadîya Kurdistanê bi neçarî ve bi vêxistna şûreşa Ilula Mezin ve di 11 meha Ilula sala 1961 hate biduçarîkirin. Vê şûresa hanê tevaya mêtûwa raperîn, serhildan û şûreşen Kurdistanê bi carekê ve didate bigewdekirin û bi şêweyekî serpîhatî û zanistî ve di bin Rêberîya Partîya Demokratî Kurdistanê û Serdarîya Qeharemanê Nemîrî Barzanî û Rêbazê wî de dihate birêvebirin. Tevaya miletê Kurd bi hemû çînî û desteyên xwe ve li her çar perçen Kurdistanê de bi carekê ve bi dil û can ve pişta vê şûreşa pîroz didatin bigirtin; jiber ku durujmê vê şûreşa pîroz: Kurdistan Yanjî Neman bi mîna durujmê şûreşa yunanistanê ve di sala 1830 de: Azadî yanjî neman dihate biberz û balakirin.

Vê şûreşê ji sala 1961 tanî sala 1975 de guhertinê pir giran û bi kêr ve di nava tevaya civaka Kurdistanê de date bikirin. Cara pêşî bû, ku Kurd li seranserî Kurdistanê de pişta şûreşa rîzgarkina xwe didatin bigirtin û Supahekî bi rêxistî ve ji nava cerg û hinavê Kurdistan di bin nav û nîşana Pêşmerge de di nava perçeyekî Kurdistanê de dihate bipêkhatin û kar û barêwan nebes tenê liberxwedan bû; lêbelê jî her kat û zeman bi nimûne ve xizmeta miletê Kurd bû; jibervêjî ve Pêşmerge şérînên ber dilên me bûn û hêvîya tevaya jîna me bûn.

Daxwazên vê şûreşa mezin roj bi roj ve bi zanebûn û şarezabûn ve ji biçük ve ber bi mezin ve dihatin bibilidnkirin; ji daxwaza pêkanîna Dam û Destgehîn Perwerdekirina Kurdistanê tanî Ewtomîji bona Kurdistanê ve hate bibilindkirin û bi peyamana 11 avdara sala 1970 de hate bixelatkirin.

Barzanîyê Nemir di vê şûreşa pîroz de bingehêni siyaseteke rast û durust û hêjîbêtir bi şêweyekî zanistî ve ci di warênd hundur yanjî derve de date bidurustkirin. Di bingehêni siyaseta hundur de pir bi nermî, li ser xwe û zanebûn ve bingeh û suwarkirinê civakî ji rehan ve didate biveguhertin. Ev bi xwejî ve şûreşek di nava şûreşekê de dihate biderkevtin; jiber ku şûreşa Ilula Mezin bi saya serê Rêbazê Barzanîyê Nemir ve bi şûreşa Welatî ve bi herdu milê xwe ve; bi milê xweyî Milî û Çivakî ve dihate biderkevtin. Di siyaseta derve de pir bi nermî ve û bi armancikî ve li ser qazanc û berjewendîya Kurdistanê de bi durbûn ve li ser bingehê pirkirina Dostan û kêmkirina Dujminanan dihate biçûyîn. Tevaya siyaseta Rêbaza Barzanî li ser bingehê lêbuhurandinê, dadwerîyê û demokratîyê de dihate bihîmkirin. Rojekê ji rojan ve di Şûreşa Ilula mezin de tundrêyî û mîrkûjî beramberî mirovên bê guneh nehate bikaranîn. Her û her bi dadwerî ve xebate me dihate bikirin; jiber ku xebata Kurd bi xebateke dadwerî ve tête biderkevtin. Tevaya Rêbaza Barzanî di kurtirin dem û kêmtilî gorî de ji bona gihadina armancê ve dihate biderkevtin. Dujminanen me bi carewkê ve di nava herçar Perçen Kurdistanê de cerg û hunav li wan de didate bisütandin û tamara mirina wan di nava seranserî Kurdistanê

de him ji wan re û him jî ji tevaya dunyayê re didate biderxistin û bayê azadîyê û serxwebûnê di nava Kurdistanê didate bigûrkirin.

Belê di encamê dawî de di nîsana sala 1975 de li ser bingehê peymana Cezair de di 6 avadara sala 1975 de di navbera Şahê Iranê û Sedam Husêن de ev şureşa mezin hate biherifandin. Belê ew bi siyasî ve hate bikevtin; jiber ku hemû şureşen meyi din bi şêweyê supahî ve hatin bikevtin. Ev jî bi saya zanebûn û dilsoziya Barzanîyê Qeheremanê Nemir ve hate bikirin û jibervêjî ve di 26 gulana sala 1976 de Şûreşa Gulanê hate bivêkevtin; jiber ku Şûrera 26 Gulanê bi dirêjbûna Şûreşa Ilula Mezin ve tête biderkevtin; jiber ku her kevtineke supahî di nava milettekî de bigir bi nivsekî û bêtir ve tête bidirêjkirin. Wehajî ev kevtina siyasî pir bi kurtî ve di şureşa 26 gulana sala 1976 de hate biçarekirin û binuhkirin.

Di encamê dawî de Şûreşa Gulana pîroz dirêjbûna Şûreşa Ilula Mezin di sala 1991 hate biserkevtin. Ji vê demê û pê ve guhertinê pir mezin û bikêr ve di nava Kurdistanâ Jêrîn de hatin biderkevtin. Parlemana Kurdistanê di 19 gulanê de hate bîhelbijartin û di 4 hizêranê de hate bikombûn. Fêderaliya Herema Kurdistanê hate bidazanîn û Serdarîya Kurdistanê hate bidamezirandin. Di 9 nisana sala 2003 Dewleta Iraqê, Rêjima Basî li ser destê Hevalbedan hate birûxandin û Dewleta Iraqê bi Dewleteke Fêderalî ve ji nû ve hate bidamezirandin.

Hiç rojeke ji rojan ve di nava mêmûwa meyi xunaviyî dirêj de bideskevtinê wetov mezin hêjî bi destê me ve nehatine bikevtin. Evjîtevjî bi saya xebata xunaviyî dirêjî Kurdistanê ve û bi saya Rêbazê Barzanîyî Nemîrî Rêberê Şûreşa Ilulî Mezin ve bi destê me ve hatin bikevtin. Merov dikare bi dilxwesî û bextiyarî ve bide bigotin: ku ev bi destkevtinê haneyî Kurdistan ve ji Barzanîyê Nemîrî Rêberê Şûreşa Ilulî Mezin ve ji bona Şêx Ubeydullahê Nehrî, Şêx Ebdulselamê Barzanî, Şêx Mehmudê Hefid, Şêx Seîdê Pîran, Şêx Ahmedê Barzanî, Ihsan Nurî Paşa û Qazî Mohamed ve têtin bidiyxarîkirin.

Berlin di 1. 9. 2004 de

Dr. M. S. Cuma